

- DÜZGÜN DENİZ di nûçe-şîroveya xwe ya bi sernavê "Dewlet ji zêdebûna kurdan ditirse", de reaksiyonên li dijî rapora Heyeta Ewletiya Neteweyî (MGK) destnîşan dike. Rûpel 3
- Hevpeyvîna ku SHERI LAIZER bi Cemil Bayık re kiribû û di hejmara 24'an a Kurdistan Reportê de derketibû, SAMÎ BERBANG beşen wê yên girîng bi navê "Demokrasiya tîrk ji bo kurda terore" ji zimanê îngîlîzî wergerande kurmancî Rûpel 4-5
- "Amûrên muzikê yên rezm û kutanê" DILDAR ŞEKO di bin vî sernavî de defa mezin, amûrên yekteple û du teple û amûra bi navê peretas dide nasin Rûpel 10

NAVEROK



Nûçe: Şîdet bi qasî şîrê dayikê
li bindestan helal e



Nûçe: Li Parîsê Konferansa
Kurdolojiyê çebû



Metin Aksay: Nahêlin ku em li
welatê xwe jî bibin penaber

Jî Xwendevan

BERÎ Büyera Susurlukê gelê kurd rîberen kurdan sed curî, hezar carî gotine "dewlet di destê hêzên, vesârtî dê ye. Ev kes bi Sava Taybet a Şer ve girêdahî ne." Serokê neteweyî deh-caran got "Özal hatiyê kuştin, Eşref Bitlis, Bahtiyar Aydin jî hwd. bi destê van bikûjan hatine kuştin" lê kesî ji berpirsan xwe neltvand. Bi ser de rojnameyên ku ev gotin dinivîsin hatin girtin û bombekirin. Her tişt li holê ye.

Di demekê de bûkê û xesîya xwe hebûn. Bük ji xesîye, xesî ji bûkê fênektir bû. Her du li benda hev bûn: Rojekê xesîye nan ji bûkê vesart. Bû évar, bûk li nîn geriya, nan tûne ye. Gera xwe domard, nîherî ku nan di tûrekî dê ye û bi besten odaye ve dar de kiriye. Destê wê nedigîhîstê, cû ker anî, rabû ser pişta kerê û nan dani xwár. Demâ xesîya wê bibêje "kê nan xwar" jî wê bibêje "wele qey kerê xwariye." Xesî hat nîherî ku nan xwarine û sopa stîmîn kerekê li odaye ye. Bang kir û got: "Ez zanîm ev sopa kerê cû ne, lê şanê bûka nû ne." Icar ev kar ji şanê bûka nû ne, lê sopa kerê mezin, kerê cû ne.

ÇİYYA MAZİ

DI destpêka serê şoreşê de heta iro gelê me geleki zehmetî kışandîye, ji her alîyi ve hatiye asîmîlekîrin. Lê gelê mî ji bo azadiya xwe ci tiştî ji destê wê bike.

Di sala 1997'an de gelê me de geleki ciyîn û rîexistinê nû çêbîke, bêhtir bi xurtî û bi şoreşî têkoşîna xwe dom bike. Daxwaziya mî ew e ku hûn di sala 1996'an de têkoşîna gelê kurd, tiştî çêbûyi bi kro-nolojîki di Azadiya Welat de binirxanî.

REWŞEN KALBİŞEN



Sala nû bibe sala astî û azadiyê

SAMI TAN

Dil dixwaze her sala nû bibe destpê keke nû. Mîrov bi hêviya rojén xweş û têkoşîna ji bo van rojan li ser piyan dimîne. Gelê kurd êdi ketiye qonaxa serfirazîye, lewre sala 1997'an ji niha ve misoger kiriye. Bes hêzên kedxwar, dixwazin berê çem û şetan bi şûn ve vegerînin, rî li ber pêşveçûnê bigirin, ji bo vê yekê jî ci ji destê wan tê dikan.

Hefteya çûyî hêzên dewletê dest bi pêkanîna fermana MGK'ê kirin. Digel pûc-bûna hemû delîlan, rayedârên HADEP'ê nehatin berdan, bi ser de jî zordestî û pêkutiyê li ser saziyên welatparêz zêde bûn.

Hevalê me jî ji van zordestî û pêkutiyân para xwe standin. Roja 21'ê berfan-barê, hevalê me Ferec Çobanoğlu li Aydînê hate girtin, bi îdiyê bêbingeh cûne serê, îşkence pê kirin. Lî pişti rojekê ew derxistin dadgehê û li wir jî hate berdan. Bes gotinê ku polîsan di bin çav jê ré gotinê, baş dide xuyan ku dewlet bi ci çavî li rojnameyâ me dinêre. Li gorî hêzên tirk "Kesên kû di saziyên wekî HADEP, NCM, Tayder, Özgür Halk, Demokrasi û Azadi-

ya Welet de" dixebeitin endamên PKK'ê yên ramanî ne. Îcar tiştî baikê li aliye, bi vî çavî li saziyên kurd ên demokratik dinîrin, li aliye din kesen wekî Şevket Kazan li Ewrûpayê derketina rojnameyâ mî wekî nîşana demokrasiyâ Tîriyeyê pêşkê dikan.

Dîsa roja 22'ê mehê polîsan dest danîn ser 200 heb nusxayê rojnameyâ me, ji bo ku li mîtingâ-DISK'ê neyên firotin. Hevalê me Seyit Karabaş jî demekê girtin binçav, paşê hevalê me berdan, lê nasnamaya wî û rojname pişti du rojan li me vegerandin. Polîsan sedema desteserkirin jî bi awayekî eşkere gotin: "Ji bo ku rojname li meydana mîtingê neyê firotin": Li aliye din ev çend hafte ne ku paketên rojnameyâ yên ku em dişînin Batmanê têne desteserkirin.

Pirtûka Yaşar Kaya ku bi navê "Gotin" ji aliye Weşanxaneya Nûdemê ve hatibû weşandin û me jî ew wekî xelata xaçepir-sê dabû girtiyek ji Girtigeha Bartınê, jî aliye idareya girtigehê ve hate desteserkirin. Ji bo vê yekê polîsan em ziyaret kîrin...

Wekî me di destpêkê de jî da xuyaki-

rin, ew dixwazin berê dîrokê ber bî paş ve bizivirîn, lê heta niha kes di vî karî de bi ser neketiye. Hêviya me xurt e ku wê sala 1997'an bibe sala azadî û aştiyê.

Divê em berxwedana gelê xwe yê ku li welatê xwe bûye penaber ji bir nekin. Xuya ye ku rîexistinê wekî Neteweyen Yekbûyî (NY) di destê welatê împerialist de bûne pêlîsk û ji armâna ku di destûr-nameya xwe de nîşandine, geleki dûr ketine. Sedema bingehin a daxwaza valakirina Kampa Etrûşê siyâsiye. Neteweyen Yekbûyî bi vê kirina xwe, daxwaza dewleta tirk tîne cih. Lî divê bê gotin ku kesen li Kampa Etrûşê jî naşîbin penaberên ku ew dixwazin. Penaberên ku NY dixwaze, divê bêrêxistin bin, her tim destê xwe li ber wan vekin, doza mañen siyâsi nekin.

Wekî encam em sala nû ya gelê xwe ji dil û can pîroz dikan, spasiyên xwe ji kesen ku ji me re kartê pîrozbaşıya hinartine re pêşkê dikan.

Her wiha em pêjinkariya xwendevanê xwe ya di warê şandina anketen de pîroz dikan. Lî divê bê gotin ku wê anket pişti vê hafteye di rojnameyê de hew derkeve. Pişti demekê emê encama anketan bidin zanîn û li gorî daxwazên we hin guherînan di rojnameyê de pêk bînîn. Min divêt bi dilîkeke kurdî dawiyê li vê nîşâ xwe bînîm:

"Serê salê, binê salê

Xwedê keç û kurekî bid vê malê..."

Nîşâna dîroka gelê kurd

YAHYA KANDEMİR

Dîroka gelê kurd heyâ yê gavê jî bi rîndî û li gorî zanîstiye nehatiye nîşandin. Sedema wê yekê jî dagirker in. Ew ji yekbûn û pêşketinê re bûne asteng. Çawa ku bablîsok li perikên çilo dixe, ji hev bela dike, bi vî rengî gelê kurd jî ji hev belav bûne.

Hemû gelan, her yekî li gorî xwe dîroke afirandiye. A gelê kurd jî bi vî rengî ye, lê li ser kaxiz û pirtûkan tiştek nehatiye nîşîn. Tenê bi devkî hînek hatine gotin û ji hêla dîrokvanen biyan ve hînek hatine nîşandin. Bi kurtasî dîroka vî gîli di tariye da maye. Tenê Şerîfî Bedlîsî hînekî li ser rawestîye. Ji bili wî ji nav kurdan dîrokvan ranebûne û tu rewşenbîrên kurd dest navetiye dîrokê.

Ji netewetiyê re nîşandina dîrokê pêwist e. Yekîtiya neteweyê bi dîrokê çêdîbe. Heke ku gelek bi dîroka xwe ne-hese, bêmîjî, bêçav, bêgûh dimîne. Eger ku gelek li dîroka xwe xwedî dernekeve wê hînek kesen din li wê dîrokê xwedî dîrokevin, û wê li gorî xwe binîşîn. Ew jî dibe sedemâ ku ew gel bibe kole û di bin destan de bîmîne.

Icar ji bo avakîra dîrokê û nîşandina wê, pêwist e ku ev gel li xwe xwedî derkeve, bikeve nav lêkolîn û lêgerê-kê da ku bikaribe rastîya gelê xwe derxe holê. Ew jî bêyî şoreşê nabe: Tenê di nav şoreşekê dijwar û giran de gengaz dibe. Lewre kesen ku rastîya gelên xwe nas dîkin û dixwazin ji bo wan tiştekî bi-

Pêwist e pirsên li ser dîrokê ji destpêka mirovahiyê heyâ roja iro wekî, ci bûye, çawa çebûye, li ku derê, li kîjan demê, sedem ci ye, mercen wê demê ci ne? Divê ev pirs tev werin bersivandin. Piş re girêdana doh, iro û sibê li gorî dîyalektîke divê derkeve rastê.

kin tenê şoreşer in. Ew şoreşer hem dîroka borî derdixin holê, hem jî dîroke ke nû. Mînak Mazlum Doğan û Egît bi lehengîya xwe dîroke çekirine.

Rast e, di nava şerî azadiye de gel xwe nas dike û pêşketinê dide çekirin. Lî ew tenê ne bes e. Pêwist e ku dîroknas li gorî rîbâzîn zanîstî û li gorî nîhîrtina çînî lêkolînê bike, rastîyan derxe holê, binîşîne û ji gel re bike mal. Her çiqas bi derketina tevgera azadiye re û di bin serokatiya wê de, gelek gavên mezin ji hêla dîrokê, çandê, wêjeyê û her wekî din ve hatîbin avêtin jî, ew têrê nake.

Tîşten ku heyâ vêga derketine holê tev wekî perspektif in. Heke ku mirov li ser vê yekê kûr nebe wê wisa bîmîne. Lî mixabin rewşenbîrên kurd, li gorî şoreşê ji dîrokê re nabin bersiv.

Dîrok, ne çend gotin, çîrok û nîşîn in: Pêwist e pirsên li ser dîrokê destpêka mirovahiyê heyâ roja iro wekî, ci bûye, çawa çebûye, li ku derê, li kîjan demê, sedem ci ye, mercen wê demê ci ne tev werin bersivandin.

Di vir-de her dema ku bidin destê xwe, pêwist e ji hêla aborî, konevanî, tîşkerî, çandî ve derxin ronahîye. Piş re girêdana doh, iro û sibê li gorî dîyalektîke di vê derkeve rastê. Divê dîroknas ji

rastîya gel ne dûr be. Bîngeha dîroka wî gelî heyâ ku diç, çawa hatîye nîşandin û vê ga rewş ci ye? Ev dîrok divê bi ci awayî were nîşandin? Gelo li gorî nîherîna çîna serdestan be an a çîna proletter be? Divê ev dîrok tu carî ji metodên zanîstî dûr nebe.

Dîroka gelê kurd, beşek e ji dîroka mirovahiyê. Ji ber vî qasî wê zehmetî pir bê kişandin. Lewre cihê ku kurd li set-bi cih û war bûne (Mezopotamya) dergûşâ mirovahî û şaristanîye ye. Bi vî rengî gerek e têkiliyên gelê kurd bi van gelên din yên mîna asûran, ermeniyan, ereban, farisan, lîdyayıyan, İskîtiyan û hwd. tebennî nîşandin.

Her wiha dîroknas divê bi aramî lê-kolîneke dorfirê pêk bîne. Ji gelek pîr-tukan, ji dîroknasen heremê û yên cihane istifade bike. Lî gerek'e bi çavekî rexneyî li wan binîhêre. Ji antropolojiyê, mîtolojiyê, kronolojiyê, arkeolojiyê û folklorê û ji gotinên di nav gel de ji sîde wergire.

Nîşandina dîrokê bi zimanekî vekirî û sivik çêdîbe. Mîna Heredot ku çiqas dîrokeke fireh bi zimanekî vekirî û sivik nîşandina. A girîng ew e ku ev dîrok bi zimanê kurdî were nîşandin. Di hêla pêkanîna vî karî de, em dereng mane, hînekî lezbûn lazim e.



GUNDEN Erzinganê yên alewiyen kurd jî têr-valakirin. Li ser bangâ Komeleya Çanda Pir Sultan Abdal, ji bo lêkolîna vê mijarê ji nûnerên saziyên demokratik heyetek hate sazkrin û ew çû Refahî-yê. Li ser qûyîna heyetê Berdevkê wê Murtaza Demir diyar kir ku, pişî hatina Yarbay Bünyamin Kur'an hêzên dewletê dest bi valakirina gundêne alewiyen herêmê kirine.

Li gorî agahiyan Kur'an gotiye. "Alewiye vira bila ji xwe re cihekî din bibîn. Ezê wan ji vir bikim der. Ew hemû ji pişta ermenan in". Tê daxuyandin ku, gelek li kesan îşkence hatiye kirin. Di heyetê de nûnêrên HADEP, ÖDP, DBP û IHD'ye cih digirin.



LICE, çend caran bi destê hêzên fermî hatibû şewitandin, ev çala-kîyên bi vî rengi hê jî dom dikin. Hate zanîn ku hêzên dewletê bi darê zorê 104 kesan kirine cerdevan. Lî gelê Licê gazî dikin ku alîkariya wan bê kirin. Di bangâ xwe de "Dengê me li dînyayê belav bikin. Bibêjin ku ev çek me ji ber zîlmî girtiye, ne bi dîlê xwe" dibêjin.

Li ser vê yekê li IHD'ya Stenbolê civîneke çapemeniyê pêk hat. Di civînê de Serokê Komeleya Licê Parêzer Tahsin Ekinci, Tanık Ziya Ekinci, Sekreterê HADEP'a Stenbolê Cemal Coşgun û Cigîra Serokê IHD'ye yê Giştî Eren Keskin cih girtin û dan xuyakirin ku "em li berpîrsê vê bûyerê gîfî bikin"

NÜÇE

DIK

Raporê MGK

Roya 17'ê aşm (meng) Rde rojnameyê Milliyetî de, jew raporê MGK vejiya. Nê raporî ra jî zey verînan boyâ gunî û îmhakerdenê kurdan vejiye.

MGK va rapordê xo de vana ke ewro doman-biyayin kurdan miyan de zaf vejiyo, eger doman-biyayin wina biramo se, sera 2025 de amoriya kurdan do bîbo %50. Wina biyayin de mebûse kurdan parlemento de êdê vêsi bê. Qandê (serva) coya Kurdistan de tayn domanan rê xelat bîdiyo, zaf domanan rê bac bigîyo. Fina rapor de vanê ke Partiya Demokrasiya Şerî (HADEP) û heveyê rojnamey û kombiyayinê (komele) PKK rê gerîla resnenê û. PKK rê alîkarî kenê. Qandê coya hema xeftiyayinê nînan vindamê.

Hema hikûmetî zey verî waştena MGK awa ana cadê ci. Bewnê senî no rapor vejiya, hema Kombiyayinê Malbatê Tepşiyayinanê PKK (TUAD) racena. Badê neya kurdan rê şasetû, zîlm û êrîşî verî ra zaf bî veşî. Lice de 200 mardim girot bin çim û vat "ya konucu bê, ya jî Lice ra şîre."

Fina badê neya nimî-nendeyê rojnameya ma yê Îzmirî Ferec Çobanoğlu girot bin çim û hevaldê ma rê şasetû viraziya. Fina 22'ê aşm dê hevalê ma Seyit Karabaşî 200 rojname berdî mîtingdê DISK de biroşo, Kocaeli de polisi hevalê ma girot bin çim û rojnamey ci ra girot. Hevalê ma o roj virada, rojnamey badê 2 rojan day ma.

MEMED DREWŞ

Dewlet ji zêdebûna kurdan ditirse

Piştî eşkerebûna rapora MGK'ê Cigirê Serokê HADEPê Güven Özata, Ahmet Türk, Mehmet Satan û Sedat Yurttaş bi hev re civînek ji bo agahdayîna çapemeniyê li dar xistin. Li gorî Özata rapor mesajê ji hêzên nêhêni yên dewletê re dişîne ku êrîşan bibin ser endam û rayedarê partiyê.

Civaka tirk û kurd hefteya borî ketübûn niqâsa rapora Konseye Ewlekariyê ya Neteweyî (MGK). Tê zanîn ku ev rapor di roja civîna Konseye Wezîran de hatiye pêşkêşkirin. MGK di rapora xwe de li ser gelek tiştan radiweste. Lî di, nava mijaran de ya herî balkêş, zêdebûna nîfusa kurdan e.

Rapor bi dorfirehi li ser zêdebûna kurdan disekine û hin pêşniyazan dike da ku rê li ber vê yekê bê girtin. Rapor bi awayekî istatistikî dinivisîne ku heke pêşî neyê girtin, wê heta sala 2025'an nîfusa kurdan bigihije % 50'yî nîfusa Tirkîyeyê û ev jî digel bilindibûna pêla neteweperweriya kurd, wê demê nimînendeyê kurd dikarin bi riya parlementeri dest hilatiyê bixin destê kurdan.

Li gorî stratejîstên raporê, xebatek bi dualî divê bê meşandin. Aliyê yekemin divê bac (vîrgî) ji kesen ku pir zarakan tînin bê stendin û kesen kêm zarakan tînin xelatê bistîn. Aliyê duymîn ji propoganda ye. Ev propaganda wê li ser gelemşeyen tendirûstî û giranbûna mercen jîyanê ya malbatê bi pir-zarok bê meşandin.

Rapor, wekî stratejiya xwe ya dema dûr van tiştan pêşniyaz dike, lê belê ji bo stratejiya dema nêzîk ji tengavkirina HADEP'ê û komelayê mafen mirovan tê xwestin. Rapor balê dikişine ser hejmara rayen ku HADEP'ê di hilbijartina giştî de girtine û wê wekî hedef nîşan dide.

Piştî eşkerebûna raporê, Cigirê Serokê HADEPê Güven Özata, Ahmet Türk, Mehmet Satan û Sedat Yurttaş bi hev re civînek ji bo agahdayîna - çapemeniyê li dar

xistin. Özata û hevalên xwe di azaftinê xwe de reaksiyonê ke tûj nîşan dan. Li gorî Özata rapor mesajê ji hêzên nêhêni yên dewletê re dişîne ku êrîşan bibin ser endam û rayedarê partiyê.

Özata wiha dom kir: "Gelo ev êrîş dişa wê dest pê bikin?" Wekî din Özata dan zanîn ku raporê tesireke ne baş li ser darizandina (mehkemekirina) serok û rayedarê partiyâ HADEP'ê kiriye. Güven Özata bi van gotinan dawiyê li daxuyaniyê xwe anîn: "Tê dîtin ku di Zagona Bingehîn de ji kurd weki súcdarê potansiyel têne pejirandin. Ji aliye din ve jî ev helwesta ku dewlet li dijî me nîşan dide di wê raporê de jî kîfî dibe."

Her wiha hinek mebûsen RP'ê yên kurd li dijî raporê derketin. Tê gotin ku Wezîrê Karê Dewletê Mebûse Amedê Salim Ensarioğlu ji Serokwezîr Erbakan re gili û gazinê xwe anîne zîmîn. Li ser vê yekê Erbakan jî rapor daye berhevkirin û bi sün ve şandiye. Lî di dema ketina civîna hikûmetê de, Serokwezîr Necmettin Erbakan "MGK'ye heta niha ku ci amade kiriye, rast amade kiriye", got.

Mebûsen Refahê yê Amedê Ömer Vehbi Hatipoğlu, Haşim Haşimi û yê Erziromê Abdulullah



Firat jî li ser vê mijarê dan xuya-kirin ku ev raporeke nîjadperest e. Wan got: "Amadekirina raporê hanê cudaxwazî ye. Di deme-ke kurt de emê bêr ba hev û wê raporê binirxîn. Heke parti ne-pejirîne jî, emê helwesta xwe diyar bikin. Divê neyê jîbîrkirin ku, tîrsin ji mirinê re ne çare ye."

Der heqê raporê de ji komela-yen mafen mirovan heta niha dengek derneketiye. Tenê Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensaroğlu da zanîn ku ev rapor belgeyeke şermnak e û ew rê ji tehcîirkirin û kuştina kurdan re vedike.

Sekreterê Navenda Komeleya Mafen Mirovan Kamil Ateşogulları ji "Her çiqas ev rapor di çapameniyê de wekî nûçê cih bigire jî, divê em wê bi çavê xwe bibînin û pişt re heke hewce bike emê hin tiştan bîbêjin" got.

Parêzer (ebûqat) Hüsnü Öndülji li ser raporê nirxandineke bi vîc rengi kir: "Gelo çîma ev rapor di

roja mehkemeya HADEPê de derket holê? Di baweriya min de bi taybetî wisa hatiye kirin. Ev karekî bêzagonî ye."

MGK dixwaze bi vê raporê artêşê li derveyî qirêjiya ku bi bû-yera Susurlukê diyar bû, nîşan bide. Ev ji tiştîkî nîşan dide ku, leşker maxwazin pûdiyê (nehêniyê) wan derkevin holê û cihoka pereyên şerê kîrât ziwa bibe.

Li gorî nûçeyen heftiya çûyî artêş ne li derveyî bûyerê ye, lew di dema bûyerên Qibrise de, Abdullah Çatlî çûye wir û mesrefen otelê ji firmayeke girêdayî artêşê OYAK Turizmê daye. Ew jî dide nîşan ku heta jiyanâ leşkeren tirk û navendîn perwerdekirina hêzên veşarî yên li Qibrise eşkere nebe, darizandina çeteyen kontrayî jî ne mimkûn e. Eşkerebûna vê raporê, helwesta dewleta tirk a li hemberî kurdan diyar kir. Hewla paqî-nîşandana artêşê têk çû.

DÜZGÜN DENİZ

Demokrasiya tirk ji bo kurdan teror e



Ev hevpeyvîn ji aliyê SHERI LAIZER ve di pûspera 1996'an de li Başûr hatiye kîrin. Di hejmara 24'an a Kurdistan Report de hatiye weşandin. Awayê hevpeyvînê ji awayê pirs û bersiv cihê ye. Di bin hin sernavan de nêrinê Cemil Bayık ji devê wî hatine dayin. Beşen girîng ên vê hevpeyvînê ji aliyê SAMÎ BERBANG ve ji îngilizî hate wergerandin.

Parastina kurdbûnê, xwe avêtina nav agir e, hem ji aliyê derûnî û fizikî ve, hem jî ji aliyê aborî ve. Demekê kurdbûn wekî tiştekî şermnak dihat dîtin, bi çavê nîv-mirovan li kurdan dihat nihêrtin. Bo nîmûne Yaşar Kemal dît ku di kurdbûnê de nan û diwaroj tune, wekî xorhekî û wekî nîvskarekî ji bo navdariyê dev, ji nasnameya xwe berda. Lê paşê ji ber ku şerî qirêjî şermazar kir, hat wê radêyê ku nav û navdarî jî di nav de, her tiş ji dest biçe. İcar heke rewşa yekî wekî Yaşar Kemal wisa he, wê ci bînin serê mirovekî ji rêsê. Ev e rengê demokrasiya tîrkan, li dijî kurdan ji bili terorê tiştek nîn e.

Em dibêjin, jin in ên ku têkoşîna me ev qas dem li ser piyan hîstîne, bêyî wan têkoşîna me wê zehmetir bûya. Dîsa jin in, jêderka mirovî û kurdbûna me. Mîran nîvher duyan jî winda kîrine. Carinan ez di civînan de vê yekê

dibêjim, hevalên jin li çepikan didin, lê ev rastiyek e. Ji ber vê yekê ew serkeftitir in, zêdetir nêzî gel in û hesta mirovahiyê bi wan re xurtir e. Ev yek jî, ji mercen jiyana wan tê. Ew merc dikin ku jin zûtir bi êşû gesiyê gel bihesin, zû reaksiyonê nîşan bidin. Pêjinkariya (hesasiyeta) wan jêderka jîyanê ye.

Kampanyaya sûixqestan a dewleta tîrkan

Saxa şerê taybet a dewleta tîrkan berî hilbijartina giştî ya 1995'an li dijî serokatiya PKK'ê hin operasyon amade kîrin. Ev operasyon jî parçeyekî kampanaya hilbijartînê bûn. Ev yek berî hilbijartînê li meydanan di xwepêşdanen de hate daxuyandin. Daxwaza wan bideş-xistina me bû, ci zindî ci jî mirî. Di hilbijartînê de jî stratejiya xwe li ser van operasyonan ava kiribûn, lê bi ser ne-

ketin. Di nav amadekarên tîmên şerê taybet de Tansu Çiller, Necdet Menzir, Mehmet Ağar, Ünal Erkan û hevalbendan wan hebûn.

Ez li Hewlîrê bûm. Dema li dijî min sîqesta têkçûyi li dar xistin. Berî hilbijartînê bi hefteyekî bû, paketa ku tê de teqemeniyê plastik hebûn, demjimêr (saet) pê ve kiribûn û li kêleka mala ku ez li dimam, bi cih kiribûn. Heke biteqiya, wê paketê dikaribû hemû avahiyê hilweşîne, dema me ew dît, ji teqîna wê re saetek mabû.

Me dizanibû ku wê li dijî Abdullah Öcalan ji êrîşek pêk were, lê me dema wê baş nedizanî. Rejîma tîrkan listeyeke hedefan weşandibû sala çûyî, navê kesen pêşeng û kadroyen ji rêsê berî nava hev dabûn, li wir armanca wan, xapan-dina gel bû.

Komara tîrkan dixwaze Başûr bike Qibriseke din

Hikûmeta tîrkan li Başûr gelekî çalak e. Hejmara tîrkanan bi zanatî zêde tê nîşandan. Kızılaya Tîrkan (Heyva Sor a Tîrkan) li Başûr di nava tîrkanan de xebatê dike; xorten tîrmenan digirin, mî-

Fermandarê ARGK'ê Cemil Bayık di sala 1955'an de li Elezîzê hatiye dinyayê. Di malbateke bi çar zarok de yê herî mezin e. Ji ber jîrekiya wî ew şandine Meletiyê lîseyê, paşê jî ji bo xwendina zanîngehê çûye Enqereyê. Li wir bi riya hevalekî xwe yê sinifê yê tîrkan Kemal Pir, Abdullah Öcalan nas dike. Hevaltiya van sê kesan jiyana wan heta dawiyê guhart. Berî hilbijartina 24'ê berfan-barâ 1995'an Bayık jî bû hedefa sûiqesteke têkçûyi.

jiyan wan av didin, wekî kontra per-werde dîkin û wan di karêñ kîrêt de bi kar tînin. Rewş gelek tîrsnak e. Çend endamên MİT'ê li baregeha Kızılayê bi cih bûne û ew ji aliyê partiyê başûrî ve têne parastin. Kesên ji Serkaniya Giştî ya Artêşa Tîrkan li Selahadînê bi cih bûne û di bin parêziyeke taybet de ne. Hin xebatê wan di nav partiyê Başûr de hene û heta li ser hin şaxen wan partiyâ jî xwedî bandor in. PDK'ê destûr da ku hevalê me yêñ ku di şerî me û wan de bi dest xistine ji aliyê endamên MİT'ê ve bêne pîrsiyarkirin. Heke partiyê Başûr rî li ber dewleta tîrkan vekin, wê bibînin ku Başûr ketiye rewşa Qibriseke.

Hevalbendiya Tîrkiye û Israîlê

Ev peymana Israîl û Tîrkiyeyê bandorâ xwe li ser tevahiya Rojhilata Navîn dike û dibe sedema hin qewimînên nû li herêmê. Her wiha bandora wê li ser tevgera kurdî jî xuya ye. Ew dibe sedema dubendiyê di nav welatên Rojhilata Navîn de, li aliyekî Tîrkan, Israîl û Amerîka heye, li aliyê din Fransa û Almanya li dijî vê hevgirtinê ye.

Yanê ew hevalbendî dibe sedema nakokiyê di navbera Amerika û Ewrû-payê de.

Di peymanê de PKK wekî hedef hatiye nimardin (nîşandan). Pisporêñ Îsrailê jî niha leşkerên tirk dîhêvojin û di operasyonan de wekî şewirdar cih digirin. Her wiha di warê zexmkirina sînor de çi ji aliye çekan û çi ji aliye teknolojiya sistêmê ewletiyê ve, Îsrail alîkariyê dide artêşa tirk. Di nava vê aîlkarîyê de kişandina têlén direhî li ser sînor û bicihkîna mayînan jî heye. Mayîn bi têlén direhî ve têne girêdan, bi serê van têlén ve ronahî heye, ew nîşan dide ku li wir kemîn hatiye danîn. Dewleta tirk hêzeke mezin li minteqeya Işikverenê kom kiriye, li wir di nava van çalakiyan de ye.

Divê ez bidim zanîn ku, dagirkirina başûrê Kurdistanê ya adara 1995'an jî bi piştevaniya pisporêñ Îsrailê pêk hat. Di vê êrişê de çi ji aliye plansaziyê ve, çi jî ji aliye teknikê ve Îsrail xwediyê roleke girîng bû. Her wiha her du dewlet agahiyêñ îstixbarî li dijî Iran û Suriyeyê berhev dîkin û didin hev.

Ev hevkî Tirkîyeyê ji cîranê wê dûr dixe, bi tenê dihêle. Her çiqas Partiya Refahê ji vê yekê re nerazibûna xwe diyar kiribe jî, li dijî vê hevkîyê tu xebatê nave. Sûriye, Misir û Iraqê li hemberî vê hevalbendiyê nerazibûna xwe eşkere kirin û li Tirkîyeyê gefxwarin.

Li aliye din hevalbenda Amerîkayê Urdînê piştevaniya vê hevalbendiyê

kir. Vê dubendiyê derfetên li ber têkoşîna me zêdetir kirin. Tirkîye li herêmê tê tecrîtkirin, gira cîranê xwe dikişine ser xwe, ji vê yekê ye ku wê Iran, Suriye û Iraq ji xwe re kirine hedef.

Tevgera kurd wê ji vê rewşê sûdê wergire, lewre yekemîn car e ku welatên ereb, dixwazin kêşaya kurd derxin pêş. Ew rûdana herî girîng a van salêndawî ye, dibe ku bibe sedema guherînen mezin di statûya herêmê de. Girîn-

kurdan dagirin. Sedema sereke ya şerîn 1992 û 1995'an ev bû. Niha rewş hineki cudatir e, lewre bandora PDK û YNK'ê kêm dibe.

Lê îcar ew destûrê nadîn partiyê nû ku tevgerê bikin. Niha demokrasî di nava buhranê de ye. Partiyê kevn dixwazin bi awayê berê rêveberiyê bikin, râ li ber pêşketina herêmê û rûdanê nû bigirin. Ew jî herêmê ji hundir ve dirûxîne, dirizîne.

Saxa şerê taybet a dewleta tirk berî hilbijartina giştî ya 1995'an li dijî serokatiya PKK'ê hin operasyon amade kirin. Ev operasyon jî parçeyekî kampanyaya hilbijartinê bûn.
Ev yek berî hilbijartinê li meydanan di xwepêşdanan de hate daxuyandin.
Daxwaza wan bidestxistina me bû, ci zindî ci jî mirî.

giya PKK'ê bi vê dubendiyê zêdetir xuya bû, lewre ci dost ci jî dijmin mecbûr dimînin hêza PKK'ê li ber çavan bigirin. Hevkêşeya di navbera her du bereyan de li gorî helwesta PKK'ê di guhere.

Rewşa Başûr û PKK

Piştî Şerê Kendavê bandora Amerîkayê serdest bû. Ji ber ku partiyê kurd ên li Başûr xwe ji desthilatdariyê re amade nekiribûn; bêtevdîr bûn, wan şansê xwe winda kir. Em lê dixebitin ku vê valahiyê li gorî berjewendiyê

Nebûna çareseriya siyasi diwaroj û dahatûya Başûr nedîyar dike. Bêyi federasyona demokratik pêşveçûna aborî jî çenabe. Heta ku statûya Başûr, rengê peywendiya di navbera Başûr û Iraqê de diyar nebe, gelemseyen dîtir çareser nabin. Tevi ku Kongreya Neteweyî nikare her tiştî çareser bike jî, dikare bibe destpêkek.

PDK û YNK li ber avabûna kongreke neteweyî dibin asteng. YNK dibêje "belê em pê re ne", lê di pratikê de li dijî wê xebatê dike. PDK dibêje "hin zu ye". Di sala 1991'ê de dema Saddam ji herêmê vekişî, hemû derfetên desthilat-

dariyê ketin destê wan. Lê piştî ev qas wext hê jî em ji bo vejiyandina parlamento dixebitin, em dixwazin ji nû ve wê rakin ser piyan. Li Başûr an wê federasyoneke demokratik pêk were, an jî wê her tişt biqedê.

Ez bi xwe ne ji bo wê yekê derketim çiyan ku li ser kuştina gelê me, şewitandina gündan daxwazîn hin hikûmetan pêk werin. Ji sala 1975'an ve çi li bajaran, ci jî li çiyan ez di nava çalakiyê de me. Sedema li vir bûna me jî, ev e ku em rî nedîn karesateke wekî ya 1975'an, heke Saddam vegere jî.

Partiyê xwecihî idia dîkin ku dan û standinê me bi Saddam re hene, lê ew tişt ne rast e. Bes tê zanîn ku kesen ku ji ber vê yekê me rexne dîkin, bi xwe ji berê ve bi Saddam re dan û stanê dîkin. Em ji wan re tiştî nabêjin, heta çêtir e ji wê ku digel dewleta tirk dijmîniya me bikin. Talabanî dibêje "Tirkîye demokratik e", di sala 1993'yan de hêzên tirk bi 50 balafirêñ şer êriş anîn ser Barregeha Zelê, ew jî bi cihîşandana fermarekî sereke yê YNK'ê çêbû. Armanca vê êrişê qirkirina me bû, wan dixwest mirovek jî li wir zindî nemîne.

Gelek mirovên başûrî dîkevin nav refîn gerîla. Bes disiplîna PKK'ê li wan giran tê, hinek jî ji ber derdê birçîbûnê tê, çekênu ku hilgîrin dibin difroşin. Heiman (eynî) problem di partiyê din jî tê dîtin. Heta PDK û YNK zilamîn xwe dişîn nav refîn hev, ew jî çekênu ku hildigîrin dibin firoşin.

Di ronakbûna kurdî de rola rewşenbîran

FAYSAL DAĞLI



Têgiha ku wekî "ronakbûn" tê binavkirin, ji bo neteweyîn cîhanê yênu ku ne bindest in û ne di bin tehdîta tunekirinê de ne tê wateyeke cuda. Lê mixabin ew ji bo kurdan wekî têgiheke taybet derkeve hemberî me ku ew jî encameke şertîn Kurdistanê ye. Ronakbûn ji bo neteweyîn azad, bûyereke berî niha bi sedan sal tîne bîra wan ku tarîtiya, wan ji ronesansê heta iro pêşveçûnê civakî, teknikî di bêjingâ demê re derbas kirine û civakîn xwe bi rînîşandariya agahiyê bi rî ve birine. Lê ew diyarde ji bo Kurdistanê teqabûlî mîjûya bipêşketina netewetiyê dike. Ji ber ku civaka kurd li ser axa xwe bi naşnameya xwe ya neteweyî ne xwedî dewlet e ku civakê rîkeftî bike û bi pêş ve bibe, negîştiye seviye neteweyî din.

Tevgera ronakbûnê ji ber taybetiyê xwe di milê tevgera siyasi de bûye, digel wê meşiyaye. Di ronakbûna kurdî de çend bûyer, qewimîn, saziyên civakî û ku rolên mezin lîstîne û tebien rewşenbîren kurd jî di vê pêvajoyê de barên giran girtine ser milên xwe. Berhemîn wan bûne hêlinâ hestîn neteweyî. Mirov kare bibêje ku yên ku neteweya kurd ji boldozera dîrokê rizgar kirine dîsa ew in:

Têgiha rewşenbîr ji ber naveroka xwe ya dîrokî di warê ravekirina xwe de bûye xwedîyê karektereke ji guftûgoyê re vekirî.

Cudatiya rewşenbîran ji muxalefi û rexnegiriya wan tê, hêza wan ji desthilatiyê (îktîdarê) dûrbûna wan e. Ew li hemberî fîkrîn hakim serbixwe ne û hilberînê wan ji çavkaniyê ku ji aliye îktîdarê ve têne xwedîkirin dûr in.

Bi gelempêri ji bo vê yekê mirov kare bibêje li alema Rojava têkiliyên entelektüel bi îktîdarîa siyasi re zêde ne baş e. Mirov li war û welatên din dikare rewşenbîr û şoşegir ji hev biqetîne, lê li Kurdistanê mirovê ku mirov be berî her tiştî pêwîst e di nav şerî rizgariyê û tevgera neteweyî ya kurd de be. Yekî ku li deveke din wekî şahê rewşenbîran bê binavkirin, heke li Kurdistanê ne welatparêz be ew dixwaze bila xwedîyê sed pirtûkan be, li zanîngehê xwedîyê sed kursiyan be û di dewletan de xwedîyê sed meqâmî be, ew ne rewşenbîr e, ne jî mirov e.

Belê ger ku rola rewşenbîren nûjen di ronakbûna Kurdistanê de bê nirxandin, mirov kare wan bi kategorîyan bîne ber çavan. Kategorîya pêşîn mirov-kare bi wekî rewşenbîren nûjen bi nav bike, bingeha ji zanîngehê modern tê û çavkaniyâ wan ramanî Rojava ne. Ew di dawîya sedsala 19'an de derdikeyin ser qada jiyanê û iro jî pêşengîya şer dîkin. Rewşenbîren nûjen bi serpêhatiyê xwe yên dîrokî, di du merhaleyan de ji hev cudabûnê nîşan didin. Qonaxa yekemîn, destpêkê rewşenbîriya nûjen e ku ew bi gelempêri bi bedirxaniyan an ji bi rojnameya 'Kurdistan'ê dest pê dike û heta nişti Şerî Duyemîn didome. Qonaxa didûyan di salên 1960'î de dest pê dike. Ew rewşenbîr iro jî rolên xwe didomîhin û di çalakiyan kurdî de serokatiyê dîkin.

Kategorîya duyemîn jî mirov kare bi navê

rewşenbîren klasik tarîf bike ku ew ji saziyên olî ji medreseyen terîq û tasawufê gîhiştine. Wan bi gelempêri di civakê de dewra xwe lîstîne û bi taybetî ji serî sedsala 19'an ta vî aliyi, li Kurdistanê hebûna xwe didomîniin.

Di jiyanâ kurdan de rola dîn gelek mezin bû. Heta salên dawîn jî malbat û mirovên bîterîq û bêşêx gelek kêm bûn. Ji Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî heta Raperîna Şêx Sêidê Paloyî, yanê ji sala 1880'î heta sala 1925'an li Kurdistanê hemû tevgerên civakî û siyasi di tesîra terîqa Neqşîberî û di destê şêxen wê de bûne. Pêwîst e Şêx Mahmûdê Berzencî bê bibîrânîn, lê ew ji terîqa Qadirayan bû û doza wî heta salên 1930'î berdewam kiriye.

Di nava wan dîrokan de ew têgîh û ew şexsîn li herêmâ Kurdistanê îktîdarîn eşkere bûne. Dîsa li Kurdistanâ Başûr hereka şêxen Heqa li ser gelê herêmâ tesîreke pozitif kir. Medrese di dema xwe de bi navê zanîngehê kurdî hatine binavkirin. Her wekî ku tê zanîn piştî ku di cîhanê de agirê netewebûnê velket û ku ew agir gîhişt Kurdistanê yêne ev sotik (bzot) di destê xwe de gerandjin dîsa sakînê medreseyan bûn. Dîsa wekî ku tê zanîn di serhildanê her car parçeyan de jî, rola mela û feqehiyen ku piyekî wan di medreseyan de bûye, hebûye. Di dîroka Kurdistanê de rewşenbîren klasik ji bo jiyanîna hestîn neteweyî rolekî gelekî girîng lîstîne. Bi taybetî di salên bêdengiyê de yanê piştî şikestina çalakiyên neteweyî giranbuha bûye. Edebiyata kurdî, ci niviskî ci jî, ya devkî ji medreseyan belav bûye û li medreseyan hatiye parastin. Em ji rewşenbîren gorbihuş' re deyrdar in.

Anketa xwendevanên Azadiya Welat

Hûn çend salî ne:

Tehsila we:

Karê we:

Hûn niha li ku rûdîgin?

Hûn ji kengê ve bi kurdi dixwînin?

Hûn cîqas bi kurdi dizanin?

- Dixwînim
- Dinivîsim
- Hem dixwînim, hem dinivîsim

Zimanê we yê zikmâkî kîjan e?

Hûn ji kengê ve bi kurdi dizanin?

Hûn ji kengê ve Azadiya Welat dixwînin?

Hûn ji xeynî kurdi bi kîjan zimanê din dizanin?

Hûn Azadiya Welat her hejmar dixwînin?

Hûn Azadiya Welat bi ci awayî (ji ku) distînin?

Hûn zimanê rojnameyê cawa dibînin?

- Hêsan (rehet)
- Dijwar (zor)

Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?

Hûn pêrî li kîjan rûpelan dinêrin?

Hûn kîjan rûpelan qet naxwînin?

Hûn bi kîjan zaravayê kurdi cîqas dizanin?

Kurmancî

- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

Kirdki (zazakî)

XWENDEVANÊN HÊJA

Di vê anketa me de du celeb pirs hene. Yêni li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye, ji bo dagirtina we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn çeperastekê (çeprazekê) deynin pêşîya yekê an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin ku li gorî daxwaz, hêvî û rexneyêne we kêmasyen rojnameyê ji navê rakin û ji bo rojnameyeke xweşik û hêjatir guherînen pêwist çêkin. Berî guherînan emê enca ma anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û ji me re bi lezgînî bişînin.

Ji bili Azadiya Welat hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?

Hûn kîjan weşanan diecibînin?

Azadiya Welat gerek e:

- Disa hefteyî derkeve
- Bibe rojane
- Bibe duhefteyî
- Bibe mehane

Di Azadiya Welat de nivîsen bi kirdki û kurmanciya jêr:

- Hindik in
- Pir in
- Bes in

Hûn dixwazin ku di Azadiya Welat de bêhtir kîjan mijar hebin?

Hûn siyaseta wesana Azadiya Welat cawa dibînin?

Di xwendina Azadiya Welat de ci tengasîyen we hene?

Hûn bîhayê rojnameyê cawa dibînin?

- Erzan e
- Biha ye
- Baş e

Ji bili we çend kesen din ji rojnameya ku hûn distînin, istifade dîkin?

Hûn rojnameyê ji maliyên xwe re dixwînin?

- Erê
- Na
- Carinan

Diyê ferhengok di rojnameyê de:

- Hebe
- Tuné be
- Hebe û cihê wê firehtir be

Raman û nêrinêne we yê din hebin li jiêre binivisin:

- Nûçeyan

- Hevpeyvînan

- Nivîsen mîzahî

- Nameyên xwendevan

- Nivîsen ji bo zarakan

- Helbest

- Nivîsen lêkolînî

Hûn xacepîrsê çedîkin?

- Tenê peyva veşarı dibînim
- Carinan çedîkin
- Her tim çedîkin
- Qet çenakim

Cihê ku em ji nameyên xwendevan re vediqetînin:

- Pire
- Hindik e
- Baş e

Bi ya we zimanê Azadiya Welat bi kîjan nivîskar hebin?

- Botankî ye
- Xerzankî ye
- Torankî ye
- Serhedkî ye
- Amedkî ye
- Kurdistanî ye

Hûn kîjan alyîn Azadiya Welat xurt (bas) dibînin?

Li gorî we nivîsen Azadiya Welat gels dibînin?

- Kurt in
- Dirêj in
- Baş in

Di Azadiya Welat de nûçe (xeber)

- Hindik in
- Pir in
- Baş in



Sekreterê Partiya Demokrasiyê ya
Pêşverû li Sûriyeyê Hemîd Derwê

dûrî civaka

**Sekreterê Partiya Demokrasiyê ya Pêşverû ya kurdî li
Sûriyeyê û parlementerê berê Hemîd Derwêş, bi kêfxweşî li
Qamişloyê deriyê mala xwe û deriyê dilê xwe ji nûnerê
rojnameya me yê Sûrî HELÎM YÜSIV re vekir.**

Hema emê ji êşa giran dest pê bikin, êşa parçebûnê, sa-xên vê êşê xwe berdidin kû-rahiya dîroka me, gelo hûn dikarin ci der barê vê êşê de bîbêjin?

■ Parçebûn kete partiya me di sala 1965'an de, bi destê Partiya Demokrat a Kurdistanê (Iraq). Bi pere û destê PDK'ê parçebûn hat holê. Me dixwest em siyaseteke serbixwe bimeşînin. Ev helwest nedipejirandin û dest dan Osman Şebîr û Mele Mihemedê Neyo û Selah Bedredin û şerê me kirin. Parti bû du parce û gelek pêkenîn bi milletê kurd kirin.

Di hilbijartinên 1990'i de hûn bi serketin û ev cara yekemîn bû ku kurdên xwedî rîexistin di Parlementoya Sûriyeyê de cih digirtin. Hûn vê bûyerê çawa dirixînin?

■ Em sê kesen xwedî rîexistin -Fuad Elîko, rehmetî Kemal Ehmed- bi ser kefin. Gelê kurd bi merdî alî me kir û em çûn parlementoyê, Bêtetrûbe, cara yekemîn bû. Endamên ereb bi çavekî xerab li me dinihartin. Digotin: "Ev kes parçebûna Sûriyeyê dixwazin." Em jî hêdî hêdî bi bêhneke fireh xebitîn, ber bi daxuyakirina vê dîtinê ku em ne ew hêza xerab in ku xerakirina Sûriyeyê dixwazin.

Me hezkirina parlementeran qezenc kir û me karekî baş kir ku doza kurdan weki rastiya wî welatî me dida naskirin. Me xwest pirsgirêka jimartîne (hejmartîna nîfusê) ku bi hezaran kurd li vir bînasname dihêle, disa pirsgirêka kembera erebî (ablûkeya ereb), rewşa xerab a cotkarêne kurd û bêkarhiştina xortêne kurd em bi wan bidin fîmkirin.

Ji aliye din ve jî, me pî bi pî bi kesen demokrat re li Sûriyeyê doz dikir ku xeleka demokrasiyê firehtir bibe û yasayêne awarte (ehikam urfiyê) ku ev 30-40 sal in li Sûriyeyê bi kar têr rabin ji holê. Her wiha me xwest ku dewlet azadiyê bide rojnameyê partîyan û kesen bêpartî ji bo ku kurd bi serbestî bixebeitin.

Di vê babetê de min li ser jimartîne daxuyaniyek li endaman û weziran yeko yeko belav kir. Her wiha nameyeke ku sî û du kesan imze kiribû me da destê Serokkomar Hafiz Esed, ji bo ku ev ji-martin rabe. Me ji bo gelê kurd li bakurê Kurdistanê jî daxuyaniyek belav kir ku ev zor û stema li ser wan divê rabe.

Gelek endamên ereb, di nav wan de jî

Basî (Baas) hebûn ku imze kirin.

Bi kurtî hebûna me di parlementoyê de gelek bi sîd bû. Ev jî yek ji riyên xebatê yên bihavil bû. Mixabin careke din nehiştin ku kes ji me here parlementoyê.

Li ser kar û barê doza kurdî, gelo hûn hetanî ci dereceyê bi hev re bûn û hûn parlementerên kurd gelo gotina we, tu carî dibû yek li ser van pirsgirêkîn germ?

■ Dîtinêne me nêzîki hev bûn, lê carinan cuðabûn diket navber me de. Hevalê Fuad Elîko carinan digot: "Tiştek-jê dernakeve." Na, eger em bixebeitin wetiştek jê derkeve. Me gelek xelk bi xwe hest kirin. Em kurd li vir jî û li seranêne Kurdistanê jî, dûrî civaka ereb û tîrk û fars dikevin. Doza me cuda dibe. Ev rewş, hêzên şovenist xurtir dike.

Carinan bi siyaseten xwe yên çewti em rê didin wan. Tu dikarî xelkê bi xwe bîhesim. Ji me dihat xwestin ku em denêgê xwe derxin û dawîya dawî ew weki xwe dikin. Lê dema me dengê xwe bilind dikir, dengê me dibihîstin. Min xwest em Qamişlo bikin pârêzgeh (mu-hafeze), bîryar hat girtin. Dema Wezîr Karêñ Herêmî (îdara Meheli) Ehmed Diyab bû, ev berpirsekî Basî bû jî. Lê ev bîryar neanîn cih. Tenê dibû ku em dîtlînen xwe bîbêjin û dengê xwe bigîhîniñ.

Xuya bû ku hukmê jimartinê ranakin. Digotin: "Ne bi destê me yê." Bîryareke siyasi pêwîst e ji bo çareserkirina yê pirsgirêkî.

Endamên Parlementoya Sûrî bi xwe, di ser nêvî re, tim bi yek bîryarê ve girêdayî ne, her tişt wê li gorî wan be. Tê wê wateyê ku parlemento né cihê girtina bîryaran e?

■ Rola wê qels e; ev parlementoyekî istişari ye, bîryara gîrsing di destê serokatiya (qutri) Basî de ye.

Salen berî 1990'i partîyen kurdî dadi-kekin meydana hilbijartinê. Lê rê nedîdan wê ku hûn derkevin, çîma cara çûy tenê rê vekirin, pişt re disa rê girtin?

Ez dê nîzanibim çîma, hînek meseleyen wan yên siyasi hebûn, tenê rê vekirin em derkekin. Bîguman eger rê bidaña, emê tim derketana. Di sala 1972'yan de, heftê wekîlên min girtin û ew avêtîn nav işkence û lêdanê. Pişt re gotin emê yekî we têxîn nav xwe. Lê dawî ew jî nekirin;

Xebata me ereb maye

Ji bili propaganda û pêhestkirina berpirs û endam û xelkên civaka din, rola we di civaka kurdî de çi guhertin dît?

■ Di nav civaka kurdî de divê yekîtîyek hebe. Ji hevketin, feyda wê tune ye. Berê di nav pêşverûyê kurd de ku çiqasî digotin ez pêşverû me, sloganên dağirîfî digotin. Lê hêdî hêdî xelk tê digihêje ku yek dikare welatparêz be bêyî kû gerekîli û jihevxitina rêtixtinê pêk bîne.

Wekî kevtirin konevanekî (siyasetvanekî) kurd, hûn li ser rewşa tevgera kurdî li Sûriyê çawa radiwestin û wê di çi qonaxî de dibînin?

■ Du sedemîn balkêş hene di paşxistin û jihevxitina tevgerê de: Yek jê PDK bû, wê roleke xerab list, parti kir du parçê û sê parçê, ya din jî destekî istixbarata Sûri tê de bû. Hişt ku bêhtir parçebûn zêde bibe. Her du sedem hûna rola xwe dilizîn. Ev rewş dibe kelem û dihêle di gelek waran de em ji hev dûr bikevin.

Tevgera me, wekî tevgereke kurdî li Sûriyeyê çarçoveya xebata me geleki teng e, dibe sedem ku em li dîwaran rast bê. Carinan tevger bi paş de vediye. Sedemeke ku li cem min girîng e jî ev e ku xebata me dûri civaka ereb maye, me bi tenê xwe dîriye; me guh nedaye ku en doza xwe bi civaka ereb bidin pejîrandin. Ez bi hêvî me ku em vê peywirê bi cih binin, niha xebatek biçûk di vê riye de dibe, lê ne wek berê ye.

Di dîrokê de tê zanîn kû tu doz bêhêz bi ser neketine. Ango tu nîrx ji dozêke mafdar re tune ye bêyî hêzeke piştgir, ev rastiyek e. Di hundîrê vê rastiyê de, hûn karê xwe çawa dinirxînin?

■ Jihevetina me wê hêzê kêm bike. Ci li wîlâtî be û çi li Kurdistanê bi tevayî be. Em nê yek in. Tevgeren kurdî çar in, pênc in, deh in. Va ye mînaka federaliyê, ku niha jî disa divê bi yekîtiyê pêk bê û ne bi tiştekî din.

Dubendiya li Başûr, dubendiyek li Başûre Biçûk jî pêk anî, bingeha vê dubendiyek bû?

■ Wê çaxê dubendî di PDK'ê de çêbû, di navbera Berzanî û Mekteba Siyasi (Politburo) de. Berzanî li aliyeke û şazdeh endam li aliyeke. Nêfîna me ku em ne aligirê kesî bin û em ne terefek bin.

Sala 1964'an ez li wir bûm. Wefdeyê (heyeta) me li ser vê bingehê şerê me kîr û bû hevalê aliyeke û bêazmûn şerê me kîr û em parçê bûn.

Malê ji te bi hezar mal be, wê çaxê YNK tune bû, tu dikari bibêji ku sedem

biryara serbixwe bû. Me xwest partiya me ne dûvik be ji PDK'ê re. Pere û azgeh didan wan, min ji Berzanî re got: "Tu dibêjî O. Sebîr û S. Bedreddin û M. Neyo kesen xerab in û tu alikariya wan dikî." Barzanî vegerand: "Ew ne partiya min in, ew ya Hebib Kerim in." Di nêrîna Berzanî de ku divê alikariya wan nebe, lê kesen din tevî rehmetiyê İdrîs Berzanî (kurê Mele Mustafa Berzanî) dixwestin ku alikariya wan bikin.

Hetanî vê gavê dubendî dimeşe di vê hêlê de, eger piştgirên aliyeke hebin ev nayê wê wateyê ku piştgirê aliye din tûne ne?

■ Niha jî wisa ye, ez hêvî dikim ku her partiyek biryara wê bê dayîn li gorî berjewendiyê kurdan û pêşvebirina mîletê kurd. A din ku partiyen kurdan li Kurdistanê yekîtiyekî di nav xwe de pêk bîniq an jî wê wek meşen hingiv di kewarekê de pingeping ji wan bê û wê doza xwe winda bikin û ez hêvî dikim ku ev partiyen mezîn dést ji hêşîrkirina biryara partiyen biçûk berdin û her partiyek biryara wê serbixwe be.

Hinekî bi derengî partiya we bi vê êsî ket, nexweziya parçekirinê bi derengî gîhişte we, lê dawiyê hûn jî ketin vê xelekê?

■ Bêguman destê xerabiyê gîhiş partiya me jî, me disa xwest em li hember bisekinin, lê me nikaribû. Ew hevalen ku ji me cuda bûn, wan jî nikaribû rêtixtina herêmekê bi tenê bidin kîleka xwe. Berê jî helwesten ku me li dijî Berzanî girtin ne sütê me bû. Van hevalan şasîtiyekê pir xerab kir. Tu piştgirêkî siyasi di nav me de tune bûn. Eger hebûna, wê ji berî sîh sali de xuya bikişana.

Hûn û Cegerxwîn heval bûn, dîwana sisîyan we pêşkêsi xwendevaşan kir. Em dixwazin ev hevalîti kîlîtek be ji bo ku em hînekî rewşa çanda kurdî bîtin zîmîn...

■ Ez biçûk bûm, min Cegerxwîn nas kir. Temenê min pazdeh sal bû. Ew di 1958'an de ket nav partiya me, bû endamî Komiteya Navendî û wîlo ma heta roja dawî ji temenê wî di 1984'an de.

Cegerxwîn wekî helbestvanekî, hozanekî bi nav û deng, cihê hezkirinê bû di nav partiya me de, belê çanda kurdî li Sûriyeyê geleki li paş e, berî niha digotin hikûmet nahêle em xebatê bikin, lê gelek rê û rîcik hene ku em tê de bilivin.

Dîsa parti û rewşenbir jî gelekî li paş in. Niha rê heye ku yek bixwîne, binivîsîne. Nivîskarek pirtûka xwe çap dike nikare ji hezar sed nusxeyî bi ciwamîri bifroş. Hunermendek pêşangehekê veđike, nikare tabloyekê bifiroş. Mirov jî

ci nivîskar be, ci hunermend be, ci kes be, ne bi nîrîn û dîtinan ve, belê bêhtir bi jiyana xwe ve girêdayî ye. Yanê karekî bêfeyde ye. Wekî ku Xanî gotiye, ji berî 340 salî ve hîna ew rewş heye. Mi-xabin ev rewş heye, hazır e, berçav e, tu dibînî ku çawa firotin û belavkirina pirtûkan bi astengî û zehmetiyan hatiye dorpeçkirin.


naçe. Çimkî her tiş bi erebî ye. Gelek şevbuhêrk û semîner û pêşangeh me saz kirin. Bi qasî ku ji dest me hat me kir, lê hîn jî ne wekî ku tê xwestin.

Niha û di van salan de çi projeyen we hene ji bo ku zimanê kurdî rabe ser lin-gan û çand û tore û hunera kurdî cihê xwe li Kurdistan û li cihane bigire?

■ Em çi bikin, wê bimîne karekî teng, pêwist e dibistan çêbin û zimanê kurdî bibe zimanê xwendin û nivîsandînê. Jîyan wîlo dide nîşandan. Em jî nikarin civaka kurd bi temamî bidin pêş, ji ber ku cihê xebata me bi sînor e û bêhtir karê me siyasi ye. Îmkaniyeten fireh jê re divê, dimîne hêviya me ku kurd zimanê xwe yê zîkmakî winda nekin. Lê karê me hîn di sînorekî teng de ye.

Gotina dawî...

■ Ez hêvî dikim, hêviya pêşveçûnê û xizmeta mîletê kurd ku riya azadiyê bi-be cirayekê bi ronayî ji bo hisyarbûna gelê kurd, hêviya xweşî û dilsoziyê ji nivîskarenê welatê xwe re dikim. Serxwebûn û pêşveçûna mîletê xwe jî nêzîk û ber bi çav hêvî dikim.



■ Hemî Derwêş li gundê Qirmanê li Dirbêsiya Başûrê Biçûk di sala 1936'an de ji dayik bûye. Xwendina destpêkî li gund kuta dike û di navbera Hesekê, Helebê û Şamê de xwendina xwe berdewam dike. Li Şamê dawî li xwendina xwe ya lîseyê tîne. Piş re dest bi xwendina hiqûqê dike, lê di 1959'an de xwe vedişêre û di 1960'î de girtinê dest pê kir. Ew jî xwe dide alî. Tenê du caran derdi keve başûrê Kurdistanê (Iraqê).

Di navbera salen 1960-1970'î de tim girtin û rev heye. Ew veşartû dimîne. Ji endamîn komiteya Navendî ew tenê ji hepsî xelas dike.

■ Hemî Derwêş wiha dom dike: "Dixwestin ez ji Sûriyeyê derkeyim. Zor hetanî li bavê min û li malbata min dikirin. Min dest ji xwendina hi-

qûqê -sala duduyan- berda. Di sala 1961'ê de yekîtiya Sûriyeyê û Misrê têk çû. Ebdulnasir çû. Cudaxwaz hatin. Ji Cemal Ebdulnasir xerabit bûn. Bi dehan caran em şandin dadgehan. Em nîv-veşartû û nîv-girtî man, hetanî 1964'an ku ez hatim girtin. A ku ez êşandim bêhtir ji girtinê ew tehqîq û pîrsin bû û ew danûstendina bêşinc, bêexlaq û bêşref...

Erê, heft caran ez hatim girtin, tevde di sal û nîvekî de. Heştê û heft rojan em di tehqîqê de man û carekê sêst roj, carekê jî pêncî rojî li gel işkence û lêdanê; ji bili heşt neh mehîn cûn-hatina dadgehê.

Di sala 1966'an de ez bûm Sekreterê Gîsti yê Partiya Demokrasiya Pêşverû ya Kurdi li Sûriyeyê û hê jî wê peyvirê dimeşinim.

Amûrên muzîkê yê rezm û kutanê

Di danasına amûrên muzîka kurdî ya vê heftiyê de, li gorî rênîşandana verêja Urya Ehmed a bi navê "Amêrekanî Musiqay kurdî" ezê amûrên rezmê (rîtmê) defa mezin, yekteple, duteple û peretasê bîdim nasîn.

Defa mezin

Defa mezin a ku ereb jê re "erbane" dibêjin, li derdora kevlekî, ango çermekî dewêr, bi bazinekî darfînî hetiye dorpeçkirin û di rengê seradê de ye. Ji bo vê amûra müzîki ya rezm û kutanê, li hînek deverên Kurdistanê "derwêşî" jî tê gotin.

Ev amûr, ango defa mezin, li cihêن taybet û di rojêni pîroz de, wekî li tekiye, xaneqa, berî xwendin û piştî xwendina mewlûda pêxember, di dema çûn û vegera heciyan de, di dema rakirina termê mérçakekî (mîrekî çê) û piştî jêrgilkirina (binaxkirina) termê wî kesî, an jî, ji bo bîrânîke xwedayı, ji hêla murid û derwêşan ve tê lêdan.

Ev def, ji hêla hundir, bi bazine dañîn ve girêdayî çat zincir hene û bi her zincirekê ve sê-çar coten xelekan helawîstî ne: Xuşexusa ku ji van xelekan tê, şûna rezmê (rîtmê) digire. Ji ber ku bi her zincirekê ve cot xelek helawîstî ne, hejmara van xelekan, bi her zincirekê ve 6-8 xelek in.

Mejûya defe

Piştî dîtina kavilekî, ango lewheyeyeke kevnar ku mejûya wê digehê 2650 sal berî zayînê, ji aliyê arkeologan ve tê

texmîn kirin ku jêdera vê amûrê bakurê Iraqê (basûrê Kurdistanê) ye. Ev kaval, niha di kevnargeha (muzexaneya) bi navê "Iraq"ê de di beşa sumerîyan de parastî ye û li ser vî kavalî wêneyê sê jinêñ tazi heye ku li defe didin.

Parçe kavalekî din ku li deve-ra Qeretepe hatiye dîtin, mêtjuya vî kavalî vedige-re sala 700'ê berî zayînê û di gel kîna rejenan (amûreke jîdarî), wêneyê du kesen dîtir hene ku defe lê didin.

Di folklor û helbesta kurdî de navê defe

"Ke seday xoşxuan naxmey def û çeng .. Be soz sazan naley çeng û def.."

Xaney Qubadi

"Mir kai biqutin def û ribaban
Bînin hemû şerbet û şeraban."

Ehmedê Xanî

Amûra yekteple

Ev amûra ku di nav gel de wekî "yektase" jî tê bi navkirin, ji kevlê (çermê) dewaran û ji kanza (şerbik) pêk tê û amûreke rezm (ritim) gitinî ye.

Ev amûra ku mîna amûra defa derwêşan li tekiye, xaneqa û di civînên ayînî de, li ser sêpiyê û rûniştî tê bikaranîn, di roja me de jî, li Kevnargeha Folklorî ya Kela Hewlîrê, li Kevnargeha Folklorî ya Slêmaniyê tê parastin û li bajare Sineyê jî, di tekiye û li deve-reñ pîroz heye.

Hêjayî gotinê ye ku ev amûr jî, mîna piraniya amûrên rezmî yê müzîka Rojhîlat, bi ber şepa



Def (erbane)

guherînan ketiye. İro, di nav gel de du cureyên amûra yekteple hene. Yektepleya biçuk û yektepleya mezin.

Mêtjuya ve amûre

Li gorî daxuyakirina lê-kolînerê hêja Urya Ehmed; di yek çavkaniyên ereban de der barê vê amûrê de gotinek jî derbas nabe û ne navê vê amûrê, ne jî wêneyê wê di hîç pirtûkeke ku li ser müzîkê hatine nivîsin, peyda nabin. Di vir de jî xweş diyar dibe ku ci di rîka duristikirina vê amûrê de, ci di riya bikaranîn de, kurdan, mohra xwe ya taybet li vê amûrê daye.

Amûra peretas, an jî rişetas

Ev amûr, ji du destikîn darfîn û ji gîlokeke pelikîn zîvîn ku bi zincirekê ve girêdayî û bi mîxekî bi serê her du daran ve hatine çikandin, pêk tê. Dirêjiya her du daran 20 cm.ye. Ev amûr ne amûra kutanê ye lê, em dikarin bibêjin; alîkar e bô amûrên rezm û kutanê.

Bikaranîna amûrê

Bî her destekî, destiyekî amûrê tê girtin û li dûv rezma stran û awazê dest diçe û tê. Digel çûn û hatina dest, di nav pelikan de ahengeke yeksane peyda dibe û dengê xişxişa ku ji wan tê, tehmeke taybet dide awaz û müzikê.

Mêtjuya ve amûre

Ev amûra ku aîîkar e ji bo amûrên rezmê, li gorî daxuyankirina Mamoste Urya; ev amûreke kurdî ye û her li Kurdistanê hatiye duristikirin. Ji ber ku heta niha, li hîç çavkaniyeke cihanê, der barê vê amûrê de nehatiye axaftin û wêneyê vê amûrê jî nehatiye dîtin. Ev amûr, bi taybeti di nav koçer û revendiyêñ ku di navbera zozañan û germinyanan de diçin û têñ tê bikaranîn. Ne

dûr e ku ev amûr, ji layê revendiyâne hatibe duristikirin. Ev ji, mîna gelek tîten kurdî, hêjayî lêgerîneke taybet e.

Amûra duteple

Ev amûra ku di nav gel de, wekî "dutasî", "neqare", yan jî "naqûre" tê binavkirin, bi kevlê dewêr ê ku bi binê şerbikekî ve, yan jî bi devê şerbikekî darfîn ve tê bendkirin, pêk tê û bi du dârikîn taybet tê lêdan.

Mêtjuya amûre

Li gorî daxuyankirina mamoste Urya di serdemê şerê xaçperestan de, di sedsalîya sêzdehan de derbastî Ewrûpa-yê bûye.

Li zozanîn Bêstûn ku nêzîkî Kurmanşan e, kavaleki kevnare hatiye dîtin û li ser vî kavalî wêneyê neçirvanekî siwar diyar e. Li paş vî siwarî mirovîkî hînek tiş hilgirtine û bi dûv vî mirrovî de jî sê rêzîn müzikjenan hene.

Rêza yekê, bi lêdana dutapleyê ye xerîk (mijûl) in.


Ev kavalê han vedigere serdema Sasanîyan ya sedsalâ sêyemîn berî zayîn. Vê hînge Sasanî deşhilatdar bûne li deverê.



Yekteple



Du teple



Peretas



Li Navendê Çandê çalakîyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamyê ya (NCM) Stenbolê

- 29. 12. 1996 Yekşem: Program: Ali, Hêlin, Melek.
- Sê reng: Tiyatro, Şiir, sinevîzyon, saet: 14.00 - 17.00
- Konser: Koma Amed. Saet: 17.30
- 01. 01. 1997 Çarşem: Konser: Koma Rojhilat, saet: 16.00
- 03. 01. 1997 İn: Film: "Rewşa awarte (Sikilyonetim)", Costa Gavras, saet: 18.00
- 04. 01. 1997 Şem: Konsera Dengbêj Seyda, saet: 14.00

Taetra Jiyana Nû: Daweya Generalê Teneke, saet: 17.30

Li Evrensel Kültür Merkezi

- 01. 01. 1997 Çarşem: Film: "Di Bin Agir de (Under Fire), Roger Spottiswoode, saet: 17.00
- 03. 01. 97 İn: Panel: "Li dînyayê û Tirkîyeyê 1996", axîfbêj: Güngör Gençay, Fatih Polat, Sevda Çetinkaya, saet: 19.00
- 04. 01. 97 Şem: Filmê zarokan: "Keloğlan" (Keçelo), Saet: 11.00
- Seminer: "Çapemenî û Civaka Paqî" saet: 16.00
- Konser: Naci Düzel, saet: 19.00

RÜDAN

Li Parîsê konferansa kurdolojiyê çêbû

Li paytexta Fransayê Parîsê di navbera rojê 13 û 15'ê berfanbarê de bi sazûmankariya Enstituya Kurdi ya Berlinê konferaseke kurdolojiyê hate lidarxistin. Konferans bi ahaftina Serokê Enstituya Kurdi İsmet Şerif Wanlı vebû. Semînervanê yekemîn yê konferansê Deniz Dargul bû. Ew li ser serhildanê kurd ên di destpêka sedsala bistan de rawestiya û bal kişande ser sedemên têkcûna wan. Li gorî Deniz Dargul, amadekarê van serhildanê ji aliye bîr û bawerîyê ve ne kemîlibûn, xwedîyê gele kêmasiyan bûn. Dargul sazûmankaren wê demê û serokatiya nûjen a kurd dan ber hev û kemîlîna tevgera nûjen destnîşan kir.

Pişt re Serokê Enstituyê İsmet Şerif Wanlı icar

weki semînervan hate ber mikrofonê. Wanlı bi giranî li ser gelemseyen metodolojik a dirokniyi-sina kurdî sekîni. Serokê Enstituyê Wanlı da zanîn ku divê rastiyê diroki bi belgeyan bîn selmandin. Li gorî Wanlı gelemseyen metodolojiyê ji aliye kurdan hê jî baş nehatiye fîmkirin.

Seminervanê sîyemîn Dr. Cabar Qadir bû. Sernavê mijara ku Qadir li ser rawestiya "Çend ditin li ser şexsiyê kurd ên diroka nêzîk" bû. Dr. Qadir bal kişande ser hin nirxandinê li ser şexsiyeten kurd ên diroka nêzîk û diyar ku ew nirxandin subjektif in û ji rastiyê dûr in. Dr. Cabar Qadir xwest ku li ser van kesan lêkolînen objektif bîn kirin.

Pişt re Dr. Qadir, Selim Ferat semînerrek li ser "Di jiyana dînî de bandora têkoşîna rizgariya Kurdistanê" da. Selim Ferat piştî nirxandineke diroka tevgeren kurd, da zanîn ku heta tevgera azadiyê, tevgeren kurd nebûne xwedîyê politiye-kê teolojik. Pişt re jî Ferat diyar kir ku tevgera azadiyê di nav mezheb û olen

kurdistanî de hevalbendiyê pêk tîne.

Seminervanê piştî Ferat, İsmail Göldâş bû. Dîrokzan Göldâş bi giranî li ser helwesta kemalizmê ya li hemberî kurdan û hin nirxandinê çewt sekîni. Göldâş da zanîn ku kemalistan her tim tunekirina gelê kurd xwestine. Li dû ahaftina İsmail Göldâş pîrsen temaşevanan hatin bersivandin û bêhnevdedana firavînê dest pê kir.

Ahaftinê piştî nîvro bi semînera Huseyin Kartal dest pê kir. Ahaftina Kartal li ser felsefeyê bû, ew li ser felsefeyâ serokatiyên tevgeren neteweyî ji sekîni. Li pey Kartal, psîkolog û rojnamevan İlhan Kızılhan li ser peywendiyan zerdeşî û êzdhîyê semînerek da. Kızılhan bi mînakîn balkêş wekhevî û cudatiyê û wan nîşan dan. Bi dû Kızılhan re, Mûsa Kavallî ser Ehmedê Xanî semîner da.

Di konferansê de ji-neke frensî ji bi ahaftineke kurd


dilxweşîya xwe ji bo besdarbûna konferanseke wiha diyar kir û sipasîyê xwe ji amadekarê konferansê re pêşkêş kirin. Li pey vê ahaftina têr-wate, semînera Dr. Azad Hamato li ser arkeolojîya Kurdistanê dest pê kir. Dr. Hamato di gel belgeyîn arkeolojîk li ser binyata kurdan rawestiya. Piştî vê ahaftinê disa beşa pîrs û bersivan pêk hat. Bi qedîna vê besê axîfbêjî asûri li bajarvaniya asûriyan kurte-axaftekin kir.

Seminera duyemîn a li ser Ehmedê Xanî Perwîz Cîhanî da; ew ji li ser filozofîya Xanî bû. Semînervanê dawîn Zerdeş Haco bû. Haco lêkolîna xwe ya bi navê "Gotinê biyan di zimanê kurdi" pêşkêş kir. Zerdeş Haco bi banga serhildanê li diji pêkutiyê dagîkeren her çar parçeyen Kurdistanê yên ji bo pişafîna kurdan, dawî li gotina xwe anî.

M. ROJAVA/PARİS

TÎŞK

LERZAN JANDIL



Maraş

R oja 24.12.1978'î diroka ma de rûpelêde siya wa. Selçukan ra bigérime hetanî T.C ye tim kes, grup û şenikatiyê ke, heqe "yewtiye" wazene, amê kîstene, amê çînekerdene. Nê şenikatiyan ra yewe jî alevî yê.

Meseleya Maraş û ê qırkerdenanê bînan ganî na çerçeve de bêro famkerdene. Kamî ke, heqe, "yewtiye" waşa, hetê koledaran ra amo kîstene. Eke imkanê koledaran biyê, koledaran nê kesî dê kîstene. Ze Maraş ebi destê faşîstan. Eke koledaran destê kesê devşîrmeyî çînebiye jî, koledaran bi xo nê kesî kîstê. Ze taxa Gazî.

Sebeta ke hemverê na qırkerdene çareseriye bêro diyene, ganî mordem verde na bawariye rind bişinasno. Eke yew mordem wûş ra û vat: "% 99'ê ma müslümân" na mesela nîna famkerdene. Çimke qe kesî jî ra nîwûrzeno û nîvano: "Nê, na varenê raşt niya."

Ez wazena zaf kîlm na der heqde baweriya xo binivîsnê. Bingepersê alevî yan jî alevîtiye hemverê na şenikatiye nêdano. Çimke "alevi-alevîtiye" zaferî seba bawariye-işlamî ênê vatene. Feçet manayake ma binê nê nameyi de fikirîme, yan jî raştiya kesanê na bawariye-işlam ra zaferî, nêzdiyê zerdûştiye, hurremîz, budîvîz, hîristiyantiye, mazdekkîz, manîzim û musevîzm ya. Na baweriye-işlam ra seremoniye merda wedadene û raya şîra ra jî 12 imamî guretê. Bê nê çiyan fenomenê na bawariye êzdiyê ehl-i Haq, êzdiyîtê û bawariyanê corênan ê. se?

Yew, na baweriye di Homa, Heq çiyê di bîxfî û ters niyo. Kesê ne bawariye şîkî Homayê xo de ronîşo, dîskîsiyon virazo, hetanî Homayê xo ra lom bikero û cira hîrs bo. Ne teynâ işlam de tim dînanê yewheqan de Homayde bazariye, dîstusîyon yan jî lom kerdene nîbenâ. O pîlê pîlan.o. Ê se va henêñ o.

Dide, ze ehl-i heqî na bawariye de ruhê mordemê merdi peyser êno. Yanê ruhê mordemî nêşono ceñnet yan jî cehenem. La belê ruh ke pêyser amê gor fîle mordamî ya kuno cesedê mordemî, mordemêde rîndî yan jî cesedê heywanî.

Hîrî, ze ehl-i heqî angorê na bawariye çar çêverî estê. Şeriat, tarîkat, marîfet, hekîkat. Kesê na bawariye xo çêverî marîfet yan jî heqîşeti de vînenê. Nayre ji çayê şeriat û tarîkatî nîmendo, demê nê hûrdmîn çêvera vîrdo ra.

Çar, seremoniye na bawareriye ze cem, sema, tamur pirodayen û deyşvatene, zîyârî, Xîzir üeb. İslâmî da duriya: Nê zaferî nêzdiyê dînanê xozayı/naturî yê.

Panc, kurumê na bawariye, ze pîr, rayber, misayib, kewra, destebira üeb nêzdiyatiyê.

Şeş, prosesê "dewlete de werêamayena" na bawariye 1960 dest kerdî ci, q ebi çepitiya şâse ama zixmkerdene.

Hawt, demê TC de çığa ke nê kesî amê kîstene, partiya dewlete CHP ya teyna îkîdar de biya yan jî şîrîgê iktîdarî biya.

Heş, na bawariye teyna xo ser ro ze yew bawariye, ne demokratika, ne laïka, ne nîzana cik a. Ze bawariyanê bînan a. La belê na bawariye seba demokrasi, laïsizm yan jî sekularizm, ilîm û avêsiyane rakerdi ya.

Ma ganî se bikeme? Her çîra ver raştiye bişinasnîme û ere dînan bidîme şinas-nayene. Vecîme re tîjiya şodîr. Eke na bêro kerdene, ez bawar kena ke xêca tenê xayîn û mordemanê mafya ra, zaferîya na bawariye alaqaya xo her het ra dewlete ra bîmenê. Daye ra dime nê kesan cephe raxeleriyene, demokrasî û zeyewtiye de organîze bikeme. Na organîzekerdenê ganî tolerans biramo, paraznayena heq û huûq û bawariyanê bînan çerçeviyê demokrasî û humanîzm de avê bero. Parola bawariye de ze xo, karkerdene de ze yewbînan. Biratiye bawariye ser ro nê, la belê kar û şariye ser ro ava bo. Eke nê niyamî kerdene, na ciyatiye, no mozaik nîbeno dewlemendiya şaran, la belê beno sebebî qırkerdene, bîlayê sarê şaran.



Darebiya evînê

Xeca dînik bi temenê xwe sih û du salî ye. Tê gotin ku dema ew xama bûye, wê û dergistiyê xwe Şero, ji bo nîşana evîna xwe bi hev re li keviya çem darebiyek çıkilandine. Wan her roj ew dar av dane û bi evîna xwe şîn kirine.

Herêma Silîva, herêma ku ji deşten dûr û dirêj pêk tê. Ew destê xwe ji Amedê dirêjî Botan dike; bêhna dilê welatê xwe, bêhna gul û sosinan, ji deşte re jiyan û evînê dişine. Deşta Bismilê jî deşteke vê herêmê ye. Di vê deşte de, gir û newalên kûr û bilind, gundên cur bi cur yên xizan û yên dewlemend hene. Newala Qurtê jî cihê xwe di vê herêmê de digire. Ew bi navê gundê "Qurtê" ku li ser Farqînê ye tê binavkirin, ji ber ku ev newal ji vî gundi dest pê dike.

wekî her û her tê gotin ku "Evîna dilşad nîn e!" Evîna wan jî ji ber bêevîniyê xemgîn û şikestî maye. Berî bi du mehan çêbûna dîlana wan, Şero bi destê kesen bêevîn û çavşoran hatiye kuştin, bi daxwaza ku keça delal Xecê, ji xwe re bikin yar. Wê ji bîlî rêtina du dilopên rondikan ji her çavekî, tû tişt nekiriye û evîna xwe, kul û kesera xwe, jiyanâ xwe, Şêroyê xwe avetiye nav kûrahiya dilê xwe, ew veşartine.

Darebiya nîşana evîna wan, ji wê rojê û bi vir de dareke hişk û ziwabûyî ye.

heft pakrewanan bi xwîna xwe tovên evînê reşandin li ser axa Deşta Bismilê.

Wê şevê dar û ber xwe bi hev gihan din, teyr û çûk veniştin li ser şaxêwan. Ezman bi ewrêne reş û tarî hat dağirtin. Ba û baran wekî bi hev re şer bîkin, hunera xwe bi vê deşte dan nîşan. Lec û gengeşeyekê di navbera xweza û zindiyan de dest pê kir. Daran gotin:

"Me divê em wan di hembêza xwe de biparêzin."

Teyr û çûkan gotin:

"Me divê em alîkarî ji bo wan bixwazin.."

Ba û baranê gotin:

"Me divê em vê jiyanâ bêevîn û bêrûmet û kirêj ji vê axê bi dûr bixînin."

Xwezayê got:

Dibe êvar, Xecê venagere gund. Şev li sibehê diqulibe, Xecê nîn e. Kes û lêzimên wê û gundi lê digerin. Vir de û wir de Xecê nîn e. Ber bi êvarê ku roj êdî dike here ava û di kûrahiya asoya Deşta Bismilê de çik sor dixuye, Xecê li ber darebiyê tê dîtin. Ew kesen ku bi saetan in lê digeriyan, tişte ku dibînin pê şas û behîfî ne, bila kevir û kûçik li wan bibariya û wan ev tişt nedîstan. Xortekî qemer û çeleng pişta xwe daye darê, çek li ser çong û serê wî di ber wî de, xwîna wî jî ji aliye kî ve herikiye li qurma darê û darebi ji wî aliye ve şîn bûye; bûtikan serê xwe vedane û ji evînê re dibişirin û Xecê jî bi destmalekê xwîna rûyê wî pakrewanî paqî dike.

Yek ji gundiyan bi tesîra şaswaziya



Li Deşta Bismilê dar û ber, erd û zevî tu car tî û birçî namînîn; xweza di zivastan û bîharê de baran û carinan jî berf, di havînê dê jî tava xwe ji vê deşte re dibexşîne, wê avî û tavî dike. Bêyî berdêlekê! Çemekî biçûk jî li nêzî gund ji kanekê dizê û xwe diavêje hembêza Dîcleyê.

Xeca dînik bi temenê xwe sih û du salî ye. Tê gotin ku dema ew xama bûye, wê û dergistiyê xwe Şero, ji bo nîşana evîna xwe bi hev re li keviya çem darebiyek çıkilandine. Wan her roj ew dar av dane û bi evîna xwe şîn kirine. Wan xwestinê ku ev dara hanê bibe berhemek ji evîna wan re. Lê mixabin,

Xecê jî wekî darê.

Xecê, her roja Xwedê satilek av di dest de berê xwe dide Newala Qurtê, darebiyê av dide, dilorîne, distire ji felekî re, ji hezî û evînê re. Lê evîn carekê tune bûye, darebî jî hişk û ziwa! Xecê hêviya xwe jê nabire, dipê.. Ew li benda evînekê ye. Evîneke paqî, evîna ji dil, evîna miş bi fedakarî dagirtî. Ew tune bûye, belki jî xwe di nav quncikîn dilên saf û mezin û dilêr de veşartîye, kî dizane?

Wê şevê Deşta Bismilê ji dengê tereqa çekan raneket. Şer ji destê evârê hetanî berbangê dewam kir. Şerî mirovatî û evînê! Di wê şeva payîzê de

"Min divê ez rojê bidim hilhatin."

Roj hilhat; rojeke paqî û bi tîn. Xeca dînik, wekî her gavê satil di dest de li ber çem e. Jinênd gund xeber û gotinan dijavêjîne ber wê. Yek dibêje:

"Hêra Xecê, me got tu dîn î, me negot tu ne jin î. Ka jînîtiya xwe bi me bide nîşan."

Yeke dî bi awayekî tinazî: "Ka tu bînîr ci dêlik e! Wekî mehînan bi rê de diçe." Gişt jin pev re dikenin. Xeca dînik guh nađe wan, satila xwe tijj av dike û dema dike bi rê bikeve, jineke din li dû wê bi ken û tiqetîq dibêje."Keçê dînê! Ez dizanim dermanê te ci ye, hahhaa!.. Te divê mîrekî, hahhaaa!

xwe dibêje: "Xecê dînê, ev kî ye?"

Xeca dînik ji wê roja ku ji evîna xwe bi dûr ketiye peyvîn bi hejmar gotine, bi ziman dibe û dibêje wan: "Ma hûn nabînîn?! Ez dîn im, lê hûn ker in! Ev mîzgînî ye; mîzgîniya evîna saf û paqî. Ka bibêjin, min ji vî dîlî pê ve tu dileki dîtir heye ku bi evîneke saf û bi fedakarî tijî ye û bi xwîna xwe vê darebiya evînê şîn kirîye, ku bi salan e bi avdana min şîn nabe? Bila ker bibîhîzin, kor bibînîn û nezan bizanîbin!.. Va ye nîvê vê darê bi vê evînê şîn bûye û dê nîva din jî bi evîna dilên mezin, saf û dilêr en wekî vî lehengî, şîn bibe..

DÎLAWER

Ji wesanenê Dozê çar pirtûk

Weşanxaneya Dozê, çar pirtûk li ser hev, pêşkêsi xwîneran (xwendevanan) kirin. Ev her çar ji bi zimanê tirkî ne. Hem ni-vîskarê wan û hem ji mijar û dabaşen wan ji hev cihê ne. Her wiha her çar pirtûk ji ji zimanê îngilîzî û swêdi li tirkî hatine wergerandin.

Weşanxaneya ku navê wê li jorê bûhûrî, digel zarê tirkî bi kurdî (kurmancî û kirdkî) ji berheman diweşîne. Bi dorê em der barê van her çar berheman de kurteagahiyê bidin.

I. Dünya Savaşı'nda Kurdistan

Ev pirtûka dîrokzan Kemal Mazhar Ahmed e. Eslê wê bi îngilizî "Kurdistan During the First World War" e û ji aliye M. Hüseyin ve li tirkî hatiye wergerandin. Navê pirtûkê li kurdî dikare wiha bê wergerandin: Di Dema Şerê Pêşin de Kurdistan.

Temaya pirtûkê Kurdistan e. Kemal Mazhar Ahmed bi taybeti di dema Şerê Cînanê yê Pêşin de li ser rewşa Kurdistanê û li ser manevrayên siyasi yê îngilistanê sekiniye. Her wiha rol û daxwazên Rûsyâ û Almanyayê ji destnîsan dike.

Li gel vê yekê, dîrokzanê kurd ê ji başûrê Kurdistanê ku li Rûsyaya, xwendîye û li Unîversiteya Bexdayê profesorê dîrokê bû, di pirtûkê de behsa tevkûji û qirkirina Ermenan dike û li ser rola kurdan a di vê yekê de, tiştinê nû û balkêş dibêje.

Pirtûk ji 348 rûpelan pêk hatiye.



Kürtler ve Kurdistan

Ev berhema hanê ji gotar yanê ji meqaleyê V. Minorsky, Thomas Bois û D.N. Mac Kenzie hatiye pê. Ev gotar ên ku di "The Encyclopedia of Islam (Ansiklopediya İslâmî)" de ber barê kurd û Kurdistanê de hatine weşandin, hatine berhevkirin û weki pirtûkekê hatine weşandin.

Kamuran Firatlı, ev gotarê zanyarê hêja û pispor, ji zarê îngilizî li tirkî wergerandine.

Ji her sê navan, nemaze Viladimir Minorsky

Weşanenê Dozê ku hem pirtûkê bi zimanê kurdî û hem ji yê bi tirkî diweşîne, çar berhemên nû li ser hev pêşkêsi xwîneren xwe kirin. Ji wan sê heb legerînî û ya din ji roman e.



mîna bavê kurdolojiyê tê qebûlkirin û gotin û da-xuyaniyê wî yê li ser kurdan xwedîyê cihêkî taybet in-a hîna ji pûte bi wan têne dayin.

Gerçi herduyên din (Tomas Bois û D.N. Mac Kenzie) ji di vî warî de xwedîyê nav û deng in. Hêjahiya vê pirtûkê, nemaze ji bo legerîner, lêkonîner û eleqedarê bi berhemên bi vî tengî, nayê salixdan. Pirtûk 241 rûpel e.

Mem û Zin'de Kürt Milliyetçiliği

Nivîskarê vê pirtûkê ji akademisyen, helbestvan û nivîskar Ferhat Şakelî ye. Navê berhemê yê orijinal "Kurdish Nationalism in Mam û Zin" e. Cara pêşin ji aliye Enstituya Kurdi ya Brukselê ve hatiye weşandin. Ş. Süer ev berhem ji zarê îngilizî wergerandiye tirkî.

Wekî ku ji navê berhemê ji (Mem û Zin'de Kürt Milliyetçiliği) bi kurdîya wê Di Mem û Zin de Netewekariya Kurdi dixuye, berhema navdar a Ehmedê Xanî Mem û Zin hatiye vekolandin û li ser raman û hizra neteweyîtiyê ya di berhemê de hatiye sekinîn. Em vê ji bi bir bixin kû Ehmedê Xanî beriya niña bi sê sed salî behsa divêtiya avakîrina dewleteke kurd kiriye û bindestî û parçebû-yiyya serek û mîrên kurdan weki şermekê diyar kiriye. Ji wan xwestiye ku ji bin siha erek, ecem û tirkân derkevin. Pirtûk 120 rûpel e.

Video Gelin

Weşanxaneya Dozê, vê pirtûka (romana) Mahmut Baksi ya ku cara pêşin bi Swêdi bi navê "Videoobrûn" ji aliye Weşanxaneya Svartvittisê ye li Stockholmê, di sala 1995'an de hatibû weşandin, bi wegera Yasemin Aymergen û Vahide Yilmaz (ji Swêdi) ıscar bi tirkî weşandiye.

Li Swêdê hem kurdan û hem ji Swêdiyan reaksiyon (ci erêni û ci ji neyîni) nişanî Video Gelin (Bûka Videoyê an ji bûkêvideo) dabûn. Ev romana bi gengeşî û nîqas 133 rûpel e.

M. RONAK

Melek Şêx Bekir

HELÎM YÜSIV



Hevalo, ez xemgîn im vê êvarê, nizanim çima berî çend rojan min pêjna te kir. Dema nameyên te, di nav pelên min de dîsa çırûsk dan. Nizanim çima ez ew qas bêriya te dikim, tim li ser dengê te dizivirim. Lî ez te nabînim, tevî ku ne xebera te yî, lî vê carê ji xem naake: Carekê din-ez lêborîn qebûl nakim.

Divê ez te bibînim, tu li ku bî divê tu veg-erî. Bi ser pênc salan ketiye ku her du çavên te dilê min digûvîşin. Melek ez hêvî dikim ku tu bêyî, malnexerabo, ma ev çol û kolanê Amûdê te ji kê re vala hiştine? Toza havînê, heriya zivistanê, bâzdana êvarê, pêkenokên belawela, dînê bêhejmar, helbest û çîrokên rojane, stranê li ber cumbuş û tembûra Şêxo... Meşa te ya sivîk, çûna ser mezel û hevpeyînê bi miriyan re, gera nîvê şevê, razana nav baxçe, keçikên xweşik... Erê, ez nizanim rewşa xwe û yara xwe ji kê re

bibêjim. Tu zanî, yara te zewicî, nema te li ber deriyê xwe dibîne. Ez ji pêkoliyan zaroktiya xwe û te ji nû ve dirêsim û diavêjim ber agirê dilê dayikan. Em her du zarokên ku di hem-bêza diya xwe de, me xewnêne mezinan didîtin.

Melek, ez dixwazim vê êvarê tu bêyî da ku tu hêstîren min bibînî, bê çawa-zora gaziñen diya min dibin: "Lawo.. mîr nagîrin." Ev ne girî ye dayê. Ev xemgîniyeke bêziman e, êşike kor e, laj e, ez tiştekî mezin naxwazim vê êvarê, hew min divê Melek ji wê dûrê vegere da ku em lîstikên xwe nîvco nehîlin, da ku vê hezkirina ku me bi hev re dest pê kir, em bi hev re bibin serî. Ji bo ku em stranê evîna xwe erzan nespîrin toza mirinê, da ku em bi hev re strana te ya "Were rindê, rindê rindê, were rindê can..." bibêjîn.

Erê hevalo ez vê êvarê xemgîn im, ma nayê bîra te çawa ji nişka ve simbêlê me derketin, wey..! Ci zû em bûn xort, me berê xwê tim bi jor ve dikir, me gaziñen xwe di bin siya Xwedayê mezin de radixistin. Xwedêyo me ci kiribû da ku qedera me ew qasî reş û xerab bû, zaroktiyeke şewîti, bêger û cilêñ xweşik, zaroktiyeke tozgirtî û birîndar û a niha xor-taniyeke tazî, dorpêkirî, ne yar, ne welat, ne pere, ne mirovayetî, ne ji bihostek ji axa azad ku xort karibe. lê rûne an rabe... Me çavên xwe vekirin li ser bindestiyê, zor, parçebûn, êlper-

estî, sînorêñ bombekirî, bavêñ tirsoñ û dengnekir, kalikêñ bêşop û pêjñ. Ji bîra min naçe ew hêrsa te, te digot: "Ez pê hest dibîm ku ez bombekey im, ez têm ku ez biteqim" ne ji civaka me, ne wî miletê me, ne ji ji gund û bajarêñ me bêhna mirovatiyê nayê, zingezinga wê pirsa te hîn li ber guhê min e:

"Ev çîma sînor ji her tişti re danîne, hetanî bi welat ji tev de sînor kirine. Lî bênamûsiya me tenê maye bêşînor."

Bi vî dilê germ Melek çûbû Stenbolê ji bo xwendinê, cara yekemîn vege riya Amûdê bi gerîm li ser xwendevanêñ zanîngêhê dîpeyiñ û dikenîya: "Ez nizanim heta kengê emê mîşa tenê biqewirîn." Berdewam dikir: "Ancax ev ciya tevde bibin agir û dînamît hetanî ku welat çêbibe." Klîliyekê dima û digot: "Diya min ji li hêviya min e du ez bibim bijşik." Ez nizanim giřing bû tu bibûya bijşik an na, lê tişte ku ez zanim ew e ku, min geleki bêriya te kiriye.

Hevalo, ez xemgîn im vê êvarê, ji ber ku navê çend şehîden din ji Amûdê û Qamîşlo û Dirbêsyê û Dêrikê û Kobanî û Efrînê û hatin bilîvîrin, navê te dîsa hat gotin. Hew çarekê min ji MED-TV'ye bihîst ku tu bûye şehîd. Lê ma qey şehîd ji bêriya hevalê xwe nakin, te bi navê min bangî min kir, ev zivîrim, lê nizanim çima her ku ez li ser dengê te dizivîrim, ez te nabînim?...


Kûçikêñ sêx

Mihemedê Begê mirovekî dila-
wer, egît û ji xwe hezkirî bû.
Şevgerê şevê, serok û rêberê
qaçaxçıyan bû. Mirovekî weletparêz
bû. Di sala 1970'yi de li başûrê Kurdistanê,
bi gorbihuştê Seîd Elçî re hate
küstün.

Di dema xortaniya Mihemedê Begêde, li bakurê Kurdistanê, mirov, karwan û hecac ji aliyê keleşan (rêbiran) ve dihatin şêlandin. Xwedê girawî Mihelmiyan jî karwanê ku dicûn Midyadê bi rê de disêlandin.

Rojekê karwanê Tinatê amade dibe ku biçe Midyadê. Wê rojê berevaniya karwan. Ji keleşên Mihelemiyan, Mihemedê Begê hildigire ser xwe. Mihemed rext û tivinga xwe dixe nav barekî û destvala dide pêşîya karwan û berê xwe didin Midyadê. Li Midyadê, bi pereyêن berevaniya xwe soleke (pêlavake) sor, bi poçik, şuxulê Amedê di ki-re, dixe piyê xwe. Li vegerê, piştî nîvro karwan di gundê Keferzûtê, di gundê şêx re derbas dibe. Mihemed ji karwan re dibêje: "De hêdî hêdî bimeşin, ezê li vê mizgeftê nimêja nîvro bikim, dawi-yê ezê bigihêjim we."

Dema diçe hewşa mizgeftê, dinêre
ku waqewaqa tistikî di bin cilekî de ji



kuçeyekê hewşa mizgeftê tê. Ji xwe re dibêje: "Wele Şêxê Keferzûtê gelek av-
zel e. Va ye ta wawîk û rovî jî anîne hî-
dayetê."

Dema cilikê hildide dinêre ku sofi-
yekî sêx di bin cilikê de dike wage

waq. Matmayî dimîne lê tiştekî fêm na
ke. Sola xwe li derê mizgestê datîne
diçe hundir. Niyeta xwe li nimêjê tîne
“Elahüekber...” Du mirovên ku li miz
gestê rûniştî bûn, ji hev re gotin: “Wele
xebîneta vî xortê nestêle (hêja) wê kû

çikên şêx sola wî bibin û wê wî pêxwas
bihêlin.” Dema Mihemed vê peyvê di-
bihîze, li nimêja xwe dilezîne. KATEK
berî katekê nimêja xwe kuta dike, der-
dikeve derve ku ferek (tekek) sola wî
xuya nake. Bi lez li wan mirovan dige-
re û doza fera sola xwe li wan dike. Ew
mirov dibêjin: “Wele kûçikên şêx bi-
rin.” Mihemed dibêje: “Ma bi kû ve bi-
rin?” Ew dibêjin: “Kuna wan di wî girê
hanê de ye, birin kuna xwe.”

Mihemed radihêje fera sola xwe û berê xwe dide gir; dema digihîje rasta sergoyê gund, dinêre sofiyek ji bin sergo derdikeve, dike ewteetwt û êrîşî Mihemed dike. Mihemed fera sola di des-tê xwe de bi hêz li eniya wî dide. Dibe kewtekewt û qajeqaja wî û diçe kuna xwe. Mihemed ji nû ve fêm kir bê.messele çi ye. Diçe ser gir, dinêre ku du sofi di koncalekê de ne, riha wan nîv metro, gevzinêka porê wan mîna zembilekê, gişt toz û qirêj, sola wî di devê wan de; dikin ireirr, dikişinîn. Sol gişt çirandine, dirandine. Mihemed dibêje: "Ax keko birawo. Ez çi bikim, tiving ne di destê min de ye. Di nav bar de bi karwan re çû. Wele minê kî. ê we di q.... jina sêxê we bi..."

BERHEVKAR: İ. OMERİ

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (48)

XACEPIRSA

Bersiya Xacenitsa 46'an

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv
bigihijin me, eme wan
binirx̄min û bi riya piskek li 5
kesan belav bikin. Xelata
heimara me va 48'an pirtükə

**"ANTOINE DE
SAINT-EXUPÉRY"** ya
Mirzayé Biçük e.

Jérénos:
Ji bo ku bersiva we bê
nirxandin, divê hûn
“Peyva Vesarî” dit navâ
quityen li bin xaçepirsé de
bintvisin ú tevi adresa xwe ji
me re hisnîn.

Pênc kesên ku xelata xâcepîrsa hejmara 46'an, pirtûka Fırat Ceweri "Gotinên Navdaran" qezenc kirine: Cemil Çem/ Stenbol, Memo Nanpej/ Stenbol, Ahmet Yılmaz/ Bazid, Rewsen Kalbisen/ Gebze, Rêzan Demirel/ Ahmed.

Katik		Gyanewer eki bi	Cedwelek	Gihanë- kek	Fexir, ser- bilindi	Dengë nexwaşan
Dengbëj- eki (wène)		zirar Fikiri	Menzere	Sir	Dewet	
Jî derveyi rê			6		Genimë kelandi	
Sembola Îtriyûmê				Nas		
5	Ask, xezal			Dewleteke ciran		
Tirêjeke sûnî			2		Kesê bê ziman	
Ruh, gtyan			Nazdar, nazik	Rêxdestin- eke faşist		
Xwarineke bi bêhn				Cihê koçeran		
Kêra ne tûj				Leng. seqet		
3	Osmün- yüm			Bend		
Meha rojlyê				Tipa dawi ya alfabé		
Sembola uranyûmê				Büyin		
	Di diroke de dewleteke kevn		1			

PEYVA VESARI





Xebata akademîk

Di 4-5 salan de heke heyeteke zimên, dîrokê û folklorê amade nebûbe, ferhengek nehatibe amadekirin, çavê Apê Mûsa vekirîne û li xortê çalak dinêrin.

Li wîlêt rojekê digel çend hevalan em cûn serdana Apê Mûsa. Enstituya Kurdi ya Stenbolê hê nû ava bûbû. Vebûna wê co-siyeke mezin kiribû dilê me. Der heqê rewşa enstituyê de min pirsek jê kir. Bersiva wî wekî her car tijî wate bû:

-Lewre nav mezin e lê, bi Xwedê qilafet biçük e. Siha me li ber çavan mezin dixuye. Lî ez hêvidar im. Bûk hate malê, raxistin û tekûzkirina malê jî li we."

Mixabin gotina Apê Musa hê jî bi tenê hêviyek e.

Çima di warê çandê, di warê xebatê akademik de pêşveçün çenâbe. Mijar û me-bestâ nivîsa min ev e. Helbet ji bo pirseke wisa xebateke dorfireh û zexm dive. Ez dixwazim li ser çend xalan rawestim.

1. Ji bo ku xebatê akademik bi rîk û pêk bêne kirin, rêxistin xurt pêk nehatiye. Ci dibe bila bibe, sedem ci dibin bila bibin. He-

ta ku organizasyon zexm nebe, kar jî nabe. Yênu ku pêşkêsiyê dikan, kar bi rî ve dibin ne xwendiyê nêrîneke zelal, demokratik û zanis-ti bin, nikarin jiyanekê nû, kesatiyeke nû bigîhîn, nikarin rewşenbir û lêkolîneran li hev bicivîni. Çawa ku heta pirsgirêka sero-kiyê ya têkoşina Risgariya Kurdistanê ne-hate çareserkerin, şores bi pêş ve neçû, heta di vî warî de jî organizasyoneke xurt û rast çenebe, pêşketin ne mimkûn e.

2. Ger xebateke bi metodên zanistî neyê kirine berhemên nûjen û delal çenâbin. Ji ber ku Enstitu, wekî nav lê ye, cihê zamîstyê ye. Ne cihê ku dilê kî ci dibêjê angô ya di sere xwe de ji geleki re bike zagon e. Xebatê ku têne kirin, divê li gorî pîvanê zanistiyê bin. Ne li gorî kîf û dilê mirovan bin. Divê kesê akademisyen nefsbîcûk be. Zanibe ji ya xwe dakev. Jixwe zanistî ji şikê dest pê dike. Ew kesê ku bibêje hebe nebe "ev rast e", li diji rastiya min rastî tune, qey dikare bi ser bike-ve.

3. Xebateke kolektif (hevkarî) divê. Ke-sen ku di warê xwe de pispor in dema li hev rûnîn, koman, komisyonan çêkin, bi hev bi-sêwirin, bi sebreke eyübî bixebeitin, rûmetê bibîne li nerfinê hev, dikarin tiştine hêja der-

mokrasiyê re bi rî kiribûna, lê armanca min ev e ku têkili û dari û standin di navbera xe-batkarê her du rojnameyan de bên çekirin.

Hinek mirov ji ber kembûna tiraja Azadiya Welat rexneyê xwe li xebatkaran digirin, carinan ji wan tawanbar dikan. Ev ji bi teva-hî ne li rî ne, Azadiya Welat xwe digihîne sê-car hezar mirovan, ev ji sê-car hezar kad-ro ne. Besî me ye? Na!

Îro kesen ku Azadiya Welat dixwîni ên ku ês dîtine, ên ku hezkirina welat û nirxên gelêri di dilê wan de hene, belê ev mirov in. Divê pisporê me hinekî kesayetiya karmen-dên ku bi eslê xwe kurd in, ji dewleta tirk re dixebeitin, ji hev bikin û dahûrînin. Dîsa divê Azadiya Welat baş berçav bike ku kâ xwen-devanên wan kî ne, li gorî potansiyela xwen-devanên xwe politikaya weşanê tespît bikin.

Divê carinan çirok, pexşan, helbesten ku di weşanên gelêri de (Axîna Welat, Ava Shin, Nûdem) têne weşandin, Azadiya Welat cih

xin holê. Lî ez bala xwe didimê, carinan sê-çar saetan li ser peyvekê tê axaftin, lî ci heyf û xebînet ku kes tu tişti ji hev fêm naked.

Her kes bi peyva "li gorî dîtina min" dest-pê dike û dûr û dirêj diaxiye. Lî li yê hem-berî xwe guhdar nake, ji bo bersivê, ji bo xwe parastinê difikire.

Mîrov dikare der heqê sedemên lipaşma-yîna organizasyonê akademik de gèlek teş-tén din jî bîne zimên. Lî ji bo niha ew qas bes in.

Sedem ci be bila bibe, di çar-pêñ salan de heke heyeteke zimên, yeke dîrokê, bêhtir jî ya folklorê amade nebûbe, ferhengeke kur-di -bi kurdî nehatibe - amadekirin, çavê Apê Mûsa vekirîne û li xortê çalak dinêrin.

Hêvî û baweriya min ev e ku xortê gi-haşfi ên bi bîr û bawerî û bi enerjî, bi metodeke zanistî mil bidin Enstituya Kurdi. Li ser bingeha ku Melayê Cizîri, Ehmedê Xanî, malbata Bedirxaniyan, Nûreddin Zaza, Hecî Qadirê Koyî, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Apê Mûsa, Ali Temel danîne, avahîyeke şox û şeng ava bikin. Ango dilekî welatparêzî, mî-jiyekî zelal, nêzîkîtêdayîneke zanistî ji xeba-ta xwe re bikin çaykanî.

HESEN ZINAR

bide wan. Hinek heval dr rûpela "Berhem" de berheman di çarçoveyeke teng de dinirxî-nin, kêm didin nasîn. Bi ya min pirtûkek bi tespitekê an jî bi hevokerê nayê nirxandin. Di mercen iro de dema xwendevanek nir-xandinan dixwîne, divê bikaribe, pirtûkê bi her awayî di hisê xwe de tehlîl bike.

Gelo mirov nikare di her bajari de, di her navçeyê de nûnerekî peyda bike? Ne bi awa-yekî aktiv be ji, ji bo ku çavdêriyê xwe bi-înîn rojnameyê, ji bo ku têkiliyê xwe bi xwendevanen rojnameyê re xurt bikin. Heke hûn daxwaz û banga xwe di rojnameyê de, li xwendevanen xwe bikin, gelo wê hinek dix-waz detnekevin?

Baş xuya ye ku, ne ji şertîn şerî gemari bûya wê iro tiraja Azadiya Welat sedhezar bûya, pêncsed hezar bûya. Ji bo rojîn wişa, disa Azadiya Welat...

CİHAN ROJ

WELAT

Rojnameya Heftiyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan İşık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karêن
Nîvisaran
(Yazi İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nîminendeyê Giştî
yê Ewrâpâyê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêmanî Sîdî
49-30-69002695

Hannover:
Selim Bîçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

BrukSEL:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçlılı
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Çend pêşniyaz

Ez dixwazim hin çavdêri û nêrîn xwe pêşkêsi we bikim. Bi qası ku tête dîtin, têkiliya di navbera Azadiya Welat û Demokrasiyê de hinekî qels e. Gelo haya ni-viskarên Demokrasiyê ji Azadiya Welat nîn e. Bi ya mirî ne hewce ye ku ilana Azadiya Welat di Demokrasiyê de bê weşandin. Divê bi awayekî surîstî her du rojnamey hev û din bidine nasîn, li hev û din xwedî derkevin. Demokrasiyê hê di rûpela xwe ya çandê de cih nedaye Azadiya Welat. Pispor û rewşen-bîrekî mîna İsmail Beşikçi, bangî kurdan dikir, digot: "Li zimanê xwe xwedî derkevin." Belê diviyabû min van rexneyê xwe ji De-

Mahêlin kum em li meletê Xwe jî bibin penaber

Li kampê meclisek ku 33 mebûsên wê hene, hatiye avakirin. Penaber hemû pirsgirêkên xwe li wê meclisê tînine ziman û ji bo çareseriya pirsgirêkan bi awayekî kolektif xebatê dikan. Her wiha li kampê rêvibiriya herêmî, Keyatî û hêzên ewletiyê jî hene.

Li gorî peymanê navneteweyî yê wekî Peymana Cenevreyê, Peymana Parisê û armanca avabûna Neteweyê Yekbûyi (UN) mafêngîn yên mirovan parastî ne, mirovek dikare li welatekî din bijî an jî ji welatê xwe here wela-tekî din. Kesê ku bi taybtî ji ber zilmê û sedemên siyâsî ji welatekî here welatekî din bijî jê re penaber tê gotin. Lî penaber dema ku kurd bin ji bo wan peyman tu-ne ne. Wekî 15 hezar kurdên ku li ser axa xwe bûne penaber, wekî dused kurdên ku ji rojhilatê Kurdistanê hâtine û dewleta tirk dixwaze wan bide destê rejîma Îrâni. Komseriya Bilind a Penaberan a Neteweyê Yekbûyi (UNCHR) rê nade wan ku herin welatekî din jî.

Li başûrê Kurdistanê 15 hezar kurdên bakurî ku ji Culemêrgê, Şernaxê û ji gundûn sînor di sala 1993'an de ji ber zîlma deweleta tirk reviyabûn, li Etrûşê di kampekî de wekî penaber dijîn.

Li gorî agahiyan li kampê mecliseke ku 33 mebûsên wê hene, hatiye avakirin hemû pirsgirêkên xwe li wê meclisê tînine ziman û ji bo çareseriya pirsgirêkan bi awayekî kolektif xebatê dikan. Her wiha li kampê rêvibiriya herêmî, kayefî (muxtari) û hêzên wanê ewle-tiyê jî hene. Gelek caran dewleta tirk ji bo ku vegerîna wan, kamp bombe kir, dîsa dewleta tirk idia kir ku di kampê de gerîlayen PKK'ê dijîn ji ber vê jî, ji Neteweyê Yekbûyi xwest ku kamp bê valakirin, lê tu encam bi dest nexist. Ji ber statifiya Hêza Çakûç û Neteweyê Yekbûyi nedihate valakirin. Pişti şerê dawîn yê PDK'ê û YNK'ê ku politikaya Amerîkayê li herêmî iflas kir û nêzîktêdayîna PDK'ê bi dewleta tirk re bû sedema ve-kişîna Hêza Çakûç û Neteweyê Yekbûyi.

Deweleta tirk ji berê ve li herêmî bi destê Hêyva Sor a Tirk di bin navê alîkariyê de karê sîxuriyê û îstîxbaratê pêk dianî, li aliyê din Hêyva Sor a Tirk ji bo ku penaberê ku ji ber zîlma dewleta tirk cûne kampê li paş vêgerîne û vegerîna wan jî li hemberî PKK'ê di qada navneteweyî de wekî malzeme bi kar bîne xebatê dike, heta bi vê mebestê di bin navê alîkariya insanî de ke-sen ku soza vegerîne didaîn, alîkariya madî dida wan.

Digel ew qas cerdê hêzên dewleta tirk û berxwedana gel, UNCHR'ê idia dike ku penaber dixwazin li Tirkîyeyê vegerin û bi vê mebestê jî qesta valakirina kampê dike. Li aliyê din sedema valakirina kampê siyâsî ye, ji ber ku li kampê rêxistinî heye û gel bi rêvibiri ya xwe bixwe pêk tîne ev jî mabesta valakirina kampê ye.

Li gorî agahiyan ku me ji herêmî standin gelê kurd li hemberî êrîşen dewleta tirk û Komiseriya Bilind a Penaberan a Neteweyê Yekbûyi, penaberê kurd û kurdên Başûrê Kurdistanê çalakiyên protestoyî pêk tînin. Li Silêmaniye, Hewlêrê û li pir deveren din bi hezaran mirov çalakiyên grevê birçibûnê, meş û xwepêşdanan pêk tînin û li hemberî heykariya dewleta tirk û Neteweyê Yekbûyi dest bi berhev-kirina imzeyan kirine, li gorî agahiyan fieta niha şes hezar imze hatîne berhev-kirin.

Hêzên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) cihê ku wê piştevaniya wan çalakiyan bikin, astengiyan derdi-xine pêş gel. Weşanên ku piştgiriyê di-dine penaberan têne tehdîtkirin, hêzên PDK'ê nahêlin ku gel çalakiyên protestoyî pêk bînin. Dîsa tê ragihandin ku di 21'ê berfanbarê de bombekirina Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Hewlêrê ji, ji aliyê ajanên dewleta tirk ve hatiye kirin, di bombekirinê de polisêk bi navê Serdar Huseyn miriye' û yet jî bi navê Nevezît Hesad birfîndar bûye.

Her wiha roja 22'ê berfanbarê li Hewlêrê ji aliyê hunermendên kurd Hozan Serhat, Rûken, Leyla û Rizgar ve ji bo penaberan konsereke piştgiriyê hatiye lidarxistin û bi hezaran mirov besdarî konserê bûne. Piş re çelengeke reş danîne ber deriyê Neteweyê Yekbûyi û dûrişmîn wekî; "Bimire hevkariya NY û KT'ê û dek û dolabên imperialist", "Bijî têkoşîname ye neteweyî", "Em cîma li welatê xwe penaber in", "Bijî serokê neteweyî Apo". Her wiha bi hezaran mirov jî, ji bo greva birçibûnê ya dorvegerî di rezê de ne, vê gavê 25 kes di greva birçibûnê de ne û li gorî agahiyan ev greva dorvegerî dibe kî bibe domdar ta ku bi be rojiya mirinê jî.

Heyva Sor a Kurdistanê ji bi

daxuyaniyekê tewra Neteweyê Yekbûyi û hevkariya dewleta tirk re şermazer kir. Vê têxistina insanî di daxuyaniyê de bal kişândiye ser tewra dewleta tirk a ku nahêle ew alîkariyê bidine gelê xwe yê li Bakur.

Heyva Sor a Kurdistanê diyar kir ku kesen dixwazin ew alîkariya wan bikin bi riya İHD'ê dikarin bi wan re têkiliyê daynin. Ji bo penaberê Kampa Etrûşê ji xebatê berfirêh dane destpêkirin, di qada navneteweyî de ji xebatê berfirêh pêk tînin.

Di MED-TV'ye de ji bang li kurdan hate kirin ku piştgiriyê bidine penaberan.

Serokê Gişîtyê PKK'ê Abdullah Öcalan ji bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew penaber bêxwedî nîn in, heke ka mp bê valakirin, gerîla dikarin ewlehiya wan pêk bînin. Öcalan wiha axwî: "Ev bîr yareke siyâsî ye, li hemberî kurdan tevkuijîk tê meşandîn, divê kurd di vê rewşê de yekîtiya xwe bi her awayî nîşanî hêzîn im-pêrialist bidin".

Li Tirkîyeyê ji Komelaya Mirovan diyar kir ku wan li ser rewşa penaberê Kampa Etrûşê seri li Neteweyê Yekbûyi dane û li Tirkîyeyê ji ji bo mirovên li kampê xebatê insanî têne kirin.

METİN AKSOY

